

MEGAZINE OF MODERN KURDISH LITERATURE

28in

28in



HOŞENG BROKA  
ESKERÊ BOYİK  
MIHEMED JÜRÎ  
MEHMÛDÊ IKO  
MİZÇÎN MEHMÛD  
MIHEMED ŞÊXO  
DILYARÊ DÊRIKÎ  
KEÇA KURD  
NİZAR AĞIRÎ  
HUSÊN MIHEMED  
EHMED TEWFIQ  
SAMÎ NAMÎ  
REZOYÊ OSÊ  
FERHADÊ IÇMO  
OSMAN MEHMED  
BAVÊ NAZÊ  
SEBRÎ BOTANÎ  
QENEWATÎ GEMO  
SELÎM BEREKAT  
EHMED HUSEYNÎ

Wêneya Bergê:

Xeco

Wêneyên hundirê Kovarê:

Xeco

Ş. Rêzani

Rehîmo

**DUGIR 10**

XWEDÎ

*Kawa Forlag*

BERPIRSIYARÊ GİŞTÎ  
*Dr. Seîd Mele*

BIRÊVEBIRÊN KOVARÊ  
*Ehmedê Huseynî  
Remziyê Kerîm  
Yihyayê Yûsiv  
Zagrosê Hajo*

BERPIRSIYARÊN HUNERÎ  
*S. Rêzani  
Rehîmo*

ABONETIYA SALEKÊ  
*200SEK*

NAVNIŞAN/ADRESS  
*Kawa Forlag  
BOX: 3437  
165 23 HÄSSELBY.  
SWEDEN*

TEL- FAX  
*49(0) 8 38 39 34*

POSTGIRO  
*692357-7*

ISBN  
*1400-591*

BERPIRSÊ ALMANYA Û  
FIRANSAYÊ  
*Dr. Mihemed Nûrî Sulêman  
Tel: 49(0)2303237367*

BERPIRSÊ NORWEJÊ  
*Ehmedê Hajo  
Tel: 47(0)2262023*

ÇAPXANE  
*Apec*

*Zgir*  
10



Bi çîştî li qor  
Alfabe, vekît û  
RÊZIMANA  
**MÎR**  
**CELADET**  
**BEDIRXANÎ**  
HER  
SÊ MEHAN  
CAREKÊ  
derdikeve

- Nivîs eger çap jî nebin, li xwedîyan nayên vegeandin.
- Ji bilî naverokê, di serastkirina nivîsan de Dugir azad e.
- Ji bilî nivîsên ko li ser navê Dugirê tên weşandin, her nivîskarek berpirsê/a naveroka nivîsa xwe ye.

Bilorîne, bike giv giv  
Ew dizanin çi giv giv e  
DENGÊ METÎN Û CÛDÎ YE  
KURMANCÎ YE WEK HINGIV E

Sebrî Botanî

**INTERNET**

//W1.261. telia.com./ ~u26104144/

3

**Pêşgotin  
Dugir**

6

**Serlêgeriya bûka Mira  
Hoşeng Broka**

10

**Keserê Payîzê  
Eskerê Boyîk**

11

**Reşîn  
Mihemed Jûri**

12

**Xwepêşandanek  
Mehmûdê Iko**

14

**Çawa hedan  
Mizgîn Mehmûd**

16

**Ewa ez pê nizanîm  
Mihemed Şêxo**

18

**Xewnên demên dawiyê  
Dilyarê Dêrikî**

20

**Bazê hêviyan  
Keça Kurd**

21

**Hevala dawî  
Nizar Agiri**

22

**De bibeze Hejaro!  
Husên Mihemed**

25

**Nerînek li Kevoka Sipi  
Ehmed tewfîq**

36

**Hesen çû dibistanê  
Samî Namî**

40

**Ki berpirsîyar e?  
Rezoyê Osê**

46

**Ne ez tenê  
Ferhadê Içmo**

47

**Qereçî  
Osman Mehmed**

48

**Hunermend  
Siûd Ehmed**

52

**Qurban  
Bavê Nazê**

57

**Ji dîmenên Cenga mezin  
Sebrî Botanî**

66

**Hivdeker  
Qenewatî Gemo**

68

**Mohirdarê Bêhûdeyiyê  
Selîm Berekat**

73

**Kewname  
Ehmed Husevni**

NAVROKA DUGIRA 10AN

# ÊŞGOTIN

## Mîratgirê reşgirêdana Botanê mir.

Xweşmêrê xewnê û pasvanê sirûdên me yên serhişk, mir.

Wek ko mirin rastiyeke be û payîza Skandînavyayê bergehên wirayî yên poşmaniyê ji bîr nekiribe, Sebrî Botanî mir.


Li van tarawgeh û sergomgehên bêhûdeyîya dilbijok, mirin, mirina helbestvanekî wek Sebrî Botanî, hiş û bîra dîrokê divejîne; dîroka şkestin ronahiyê û dîroka hişyarkirin û geşkirin û ber bi rehên dil ve rakîşandina regezên xewn û xwezî û hêviyên beravêfî yên helbestvanê kurd.

Helbestvanê ko di dibistana êş û şîngirî û derd û azar û renc û kulên vê serdemê de hatine perwerde kirin û bişaftin.

Helbestvanên ko di paş delke û çeper û senger û percan û bendên xewna giranbûha de, kulfîkên çiyar û çilmisîna heyvên çavên dayikan bi jena dilên xwe av didin û peyva kurdî bi ro - dikên giyanên xwe ji seqema gawirane diparêzin.

Yên wek Sebrî Botanî hem helbestvan bûn û hem jî zîlam û leşkerên nenas ên vê serdema bêbext bûn.

Helbestên wan zîlamên bejinbilind jî, berî ko helbestine nûdem û nûjen û rengvedana çand û şaristaniya dagîrkeran bin, çemên nalîn û axînkêşana gelê kurd bûn, qederên rûreş û dîmen û dengvedanên jîndar ên pêvajoya kêferat û xebata laş û giyanên azadîxwazên kurd bûn.



Û di herikîna demê de jî qîrîn û hawara xewn û arezû û dilbijandin û sawa rewşenbîrên kurd bûn.

Helbestên wan zilamên bejinbilind berî ko ekol û rêbaz û dibistan û perwerdegeh bin, berî ko bi karanîna têrm û hevokên wergirtî yên Rojhilat û Rojava bin, têramandin bûn, nêçîra îsteghên xwînê bûn, hewldana zeffkirina balendeyên kêfxweşî û dîlanan bûn, çirayên xemgîn ên reşkonên şîngiriya dayik û xwişk û yar û destgirtiyan bûn, pîvan û qonaxên dastanî yên kûrahiya birînan bûn, velerzîna li hemberî asoyên tavsorkê û rojavahiya deşt û çiyayên efsanewî yên kurdistanê bûn.

Helbestên wan zilamên bejinbilind berî ko xweşandan û navbixwexistin û nêçîra di ava şêlû de bin, volkanine ji hesret û bêrîkirinê bûn, sirûdên nemir pêşkêşî reşgirêdana Cûdî û Qendîl û Şaho dikirin. Kêlên şehîdên me bi nermabarana evînê û bi keskesora xatirwestinê dixemilandin. Darbestên serdema me hem bi nîfiran û lanetê û hem jî bi xunava sorgul û alalan û bi ximaveke dilsoj û mehreban dinimandin. Zersosinên doza me, bişkojên giyanên me, bi destmalên bêrîkirina malkambax dinixumandin.

Lewra peyvên wan her û her wek xetîrene ebedî dê di şevistana sînoran de biçurisin û ritm û newaya sirûdên wan jî her û her dê di bîra me de wek keservedanine dijwar bizingin.

Dê zingîna wan di çeşnê qedexemaça Zînê de be..

Dê zingîna wan di çeşnê zelaliya krîstalî ya bengîniya Şêxê Senan de be..

Dê zingîna wan tolgirtin be, dê heyfhilanîna ji ferhenga rêvingî û koçbarî û ewrên giran ên esmanên tarawgeh û sergomgehan be.

Bejinbilindiya wan zilaman jî ew e ko dê ne li jînê bin lê wek Agirî dê hetahetayê bijîn.

Wek ko çawan mirina wan rastiyeke ji rastiyan jiyane ye dê berdeamiya hebûna wan jî rastiyeke e dîtir be.

**Erê helbestvano!**

Erê hey hozanê şevistana dereng mayî ya mişextan!

Erê hey xemxurê berfa dilovan a zinar û tengerêyên ser-  
pêhatiya sermedî ya nexşeya serjêkirî!

Em dê çawan goristanên paytextên zuhayiyê hînî şaneyên  
laşên helbestvanan bikin û zixtên vege û bendeman û bêrîkir-  
inê ji ser mermera kêlan dawêşin?

Em dê oxira te bi kîjan zimanî, hey Seydayê rewanbêjiya  
sirûdan! ragihînin bişkiwîna bişkojên çavliremanê û em dê ji deşt  
û newal û dol û pesar û nihalan kîjan gulê ji boyî xatirxwestina  
te hilbijêrin?

Dê gulên me ji ax û gulistana helbestê bin Seyda!

Dê gulên me gulên girî û şevbuhêrk û dostanî û dilpakî û evînê  
bin Seyda!

Dê gulên me ji gulwaz û sertacên Amed û Mehabad û Sersing  
û Dugirê bin Seyda!

Dê gulên me wek berbangên Helebçeyê xemgîn bin Seyda!

Dê gulên me wek surdarî û sersomiya biyaniyan, guline windayî  
û sergerdan bin Seyda!

Erê helbestvano!

Dem ne dema xweşmêran û siwarên peyvên rasteqînane bû,  
lê tu jiyane wek ji bermaya talanê hildibijêrî!

Dem ne dema vehesîna şûran û rawestana xame û pênuşan  
bû, lê tu alên dilê xwe, tu çiyayên bêdengiya xwe bilind dikî!

Dem ne dema xatirxwestinê bû, lê tu nisrînen xewna xwe bi ser  
çavên me de dibarînî!

Dem ne dema girî bû Seyda, lê tu me û giryanê li pey xwe  
digirînî!

**DUGIR**

# SERLÊGERIYA

## BÛKA MÎRA

HOŞENG BIROKA

**D** ûkelkêşên zivistanên te bûn  
sersedên êşê;  
ew êşa ko çar aliyên te parvekîrî

kesera êvarîyan di rojavahiya  
îskeîskên min de  
dinijinand.

Û tu dihafî...

Bawîşkên Ararat,  
sersotkên ko li Cûdî û Hekarî,  
di bendewariyê de zîq,  
hevpeyvînên dûmahîka şevê,  
û her fişfî, nişan dida,  
ko tu dê nêzîk  
bîbarî.

Û tu her dihafî...

Fûrandina qehwa min, di serê sibehê de  
qasida nêzîkbûna qedera te bû.  
Wê sibekê,



ne wekî her carê,  
te fincana min bi rê û şivîlekên  
sermedî  
dagîr dikir.

**D**ema ko karwanê xwazgîniyan,  
di tarîşevan de  
filîkên xwe ber bi te ve

dikirin:

"Bûka Mîra hat... Bûka Mîra hat"

Wê gavê;

ew hicrika di pala gir de,  
xewlegeha weşandina gunehên min û te bû.

Ji wan gunehan ve

Min tu li ser filîka xwe

ya ko te bijarfî,

pêçayî,

terîşeke kesk.

Ez û tu,

di pêşîra yek hicirkê de

hatibûn rakişandin.

Me gunehên xwe

bi alên wê re

ber bi ba dikirin.

Di rojên şahî û erefatan de,

tiştên min û te,

li hev û din mikur dihatin,

û axika di guşê destmalka te de,

hişk girêdayî



mîna mizgînokekê  
darêjî nav tilîkên min û te dibû.

**D**ema ko tarîk bi ser me de  
dadihat û em dadiqulpandin  
kêfîkên geryanê,

bi pêxistina nalenalan re  
dest pê dikirin,  
û destên min  
du dehlên ji xweliyê bûn,  
li ser kêlekên te  
kolan bi kolan  
dinaliyan.

Di vê geryanê de,  
ne çavên te, ji hilperikîna asoyan  
diwestiyan,

û ne jî min dişiya,  
te bispêrim  
dîwarên jibîrkinê.

Û tu her dihatî...

Dengê te,  
ji paş oqyanosên taristanê,  
ber bi kesera min ve  
diherikî.

Û rojava,  
dûkela asoyekî hingavî bû,  
li şûn qedera te,  
her dibawîşkiya.

Reşî dihat,  
civanê xelweta min û te bû.

Û rûkê te  
 di hişyarbûna goristanan de  
 heyveke vemirî bû,  
 ji ser astankên bendwariyê  
 bangî serdanvanên êşa xwe  
 dikir.

Û aniha....

pişfî çar welatan ji bendemayîne  
 tu dê filikên xwe  
 jibo bidarvekirina kîjan rengî,  
 yan serbitackirina kîjan  
 serokî

bikî dargulîk?

De bêje bo min yarê!

Tu dê tidarikeke, ko hêjayî êşa me  
 ji pizrûkên kîjan baranê,  
 xewna kîjan hicrikê,  
 û şêtbûna kîja demsalê,  
 li dar bixînî?!

De bêje!

26. 05. 97 Bielefeld



# Keserên Payîzê

ESKERÊ BOYİK

**A**x, paîza vî welatî ça medeye, ça ewrîne,  
Vê êvarê bîna bê tê, baran hûr- hûr direşîne,  
Derd- kesera dil min kiriye dolîdanga bêgumanî ye  
Bin miqamê belgweşîna mitala de, dikilê û dive- tîne.

**Q**ulingekî xalîfî me jî ref- hêzê xwe qetyayî,  
Van duryanê cihanê da mame melûl, ner weşyayî,  
Sur- seqemê vê payîzê, şeverêşa şeva dirêj  
Derge xere min dadane, ezman ewr e, nave sayî.

**G**azînê xwe ez kê bikim? Ne pismam e ne jî heval,  
Xerîbî mer kul û derd e, te'n û niçe, xem e- xiyal,  
Dengê defê dûr ve xweş e, welat xweştir tu war tune  
Ser bilîndî ye, dê û bav e, zar- zîman e, milk e û mal

**X**weyza min wî evdê xwedê, ko ser axa kal- bava ne,  
Ko derd-kulê xerîbya tel, tam nekiryê û nizane,  
Mîna min wa nebûyê koçer, bêmal- bêcî, jî sur- serme  
Vê cihanê direve û cî navîne, bê guman e.

**P**ayîz e, ax, nel diwaşîn, baran hur-hur direşîne  
Vî cîyê xerîb poşman- metel û bêguman sekinîme,  
Rê jî tune, şînde herim, welat tune lê vegerim,  
Ev dera jî bi rik- kîn e, min feqîrî nahebîne.

1997



# RE-Ş-ÎN

MİHEMED JÛRÎ

**E** frîtên çaxê nûxwaz,  
Di ezel de.  
Min û te û hijmarêa rojan.  
Li şevên şevreving î,

Ditirsim,

Giyanê min î jehrawî....

Li ziviroka bêhin.

Ji dûr ve,

**Bi qeşengiya bejna te dixurrim.**

**Kî tawanbar e....?!**

Bişkur e zaro di zik de,  
Bêhna barûtê bihilmîsîf.

Ji êk vebijikim.

Eveye çîroka kal û nûxwaz,  
Ji nû ve....

Fenayê bi xu ve digire

Ji kavilûjankê xu

Bi reşreşka

We jî şepirzeyê rêvingiyê bim.

Dipirsim

Li çi dem/ li çi xal....?

Bi mesfî,

Lêvên hev digezîn.

Ya dixwazî.

Bi xopan î,

Bi tinê, ez

Û

Tu

Beref gerdûnekî nû

Bi

Fi

Rî

N

*Hanover 17. 02. 1997*



# Xwepêşandaneke

MEHMÛD IKO

ÇENDÎ CIWAN E RENGÊ TE, ÇENDÎ XWEŞ E BÊHNA BAYÊ TE,  
ÇENDÎ ÇELENG Û NAZDAR E BUHARA TE. LÊ MIXABIN EZ ÎRO JÊ BI DÛR  
KETÎME.

**C**arekê.  
Ez û çenteyê xwe tevî xwepêşedanekê dibûn.  
Carekê

Ez û pelên rojnameyê qermeçandî  
Di bin ewrekî de hunda dibûn...

Carekê jî.

Ez û êşek lihev dibaniyan.

Me tevan hêvî dikir. Û

Di xewnên Boxê Birîvayê de

Em hunda dibûn

Li ser danîşgehekê

Li hêviya tirênê

Çend destên derewîn

Li hev dinerîn,

Danîşgeh siwar dihat û

Ew li şûn xwe ji bîr dikirin...

Çend beşîşandinên kelovajî

Di xaçîrêkên jibîrbûyî de

Xwe dilivandin.

Carekê

Siwarekî ji min dipirsî:

-Kîjan rê diçe rojhilatê?



-Min destê xwe ber bi rojava de vekir û gotê:  
 - Rojhilat di kitanên jinbiyan de hunda bûye.  
 Çi rojava yan rojhilat,  
 Ma ne erd girover e.  
 Carekê jî  
 Li keçeke çeleng rast dihatim.  
 Xwe dexlî min dikir û dipirsî:  
 - Wa xorto, ma te destgirtiyê min bi rê de  
 nedî?  
 Çê li kîjan rê dikir  
 Min nizanîbû.  
 Bi can zarokî  
 Ez û ew li qehweyekê rûniştin.  
 Me du peyalên me yê  
 Bi ser canê xwe de dadikirin.  
 Ew canê zarokî dibû kalekî heftê safî,  
 Zembîlfiroş weke xunavekê.  
 Xwe berdida dilê me.  
 Û  
 Bêhna demên çûyî ji çixareyên me dihatin.  
 Û roj kelogirî dima  
 Di cihê xwe de.  
 Êvarê bi mehirvanî  
 Em pêşkêşî tabloyên paşerojê dikirin....  
 Dîsan em sergêj vedigeriyan tobedariya  
 Şêxan....  
 Lê bi rê de siwaran ji me re digotin:  
 -Ma we nebihîstiyê ko Gurî girtine.  
 -Û hespê Ahmedê Silêman jê dizîne.  
 Em di kolanên bê xwedî re  
 Dîsan derbasî xwepêşandanê dibûn.  
 Û xwepêşandan ji hev perçe dibû,  
 Xwepêşandan diçû, Û  
 Em perçebûyî li şûn wê diman.



# ÇAWA HEDAN

MIZGÎN MEHMÛD

**P**îşfî ko pişta dema min û te  
Tewiya bû ji ber qulincên  
biyaniyê

Dê çawa hebe hedan...?

Kanî hedan...

Çawa hedan...?

Û damarên xwîna me

Ji wê gavê de

Dijîn di rapefîneke dûvdirêj de

Çawa hedan?

Û ahîn û kela nava dilê me

Şoreşeke bê hedan

berdewam dikin

Çawa hedan?

Û dilê min şkest û bela wela bû

Çawa îro buhara me

Tert û bela dixuye

Di himbêza çavên te yên

westiyayî..

Çawa hedan...?

Û îro ez kesera diqurpînîm

Di himbeza xwe de

Di berfa vî welatî

Berfa ne berf..!

Welatê ne welat..!

Da ko bi aramkêşî



xwe bidin nasîn

Wî çaxî

Ez xweş dizanim

Çi ye biyanî?

Çi ye bêdengî?


Çi ye bêmalî?

De were lo!

Ey bêmalo.. de were!

Ne guneh e...  
 Ko kufîkên me careke din  
 bibîşkivîn  
 Ne şerm e...  
 Ko çavên me careke din bi hev  
 re biaxivîn  
 Çawa hedan...?  
 Xewnên şevan li min û te qaçax  
 bûn  
 Hêvî û omîd  
 Li ser serê me bûn perwan e  
 Navin bijîn li buharekê  
 Bê xecxecok û binefş  
 Bê gelawêj û xunav

**C**awa hedan...?  
 Û ev hiş bûye  
 5 Derya bîranînê  
 Û zingezinga bîranînan li çep  
 Li rast  
 Zû berze dibe di nav dûmana  
 Vê dema xapînok  
 Çawa hedan...?  
 Û raman nema dikare  
 Wêneke xewneke rengîn  
 Ji ber ko îro... raman jî  
 Şepîrze ye di taristaneke reş û  
 tarî  
 Di havîneke germ û dojhê de  
 Û ew havîn bê sî ye  
 Di tebaxeke pelweşyayî  
 Û bi ser wilo de  
 ew tebax bê fêkî ye.





# Xewnên Demên

## Dawiyê

Dilyarê Dêrikî

**E**z li ser xewnên demên  
dawiyê

digiriyam

Giriyê mendalekî

Li ser termê dayika xwe

Giriyê dilyarekî

Ji xinizîya dilvîna xwe

Giriyê kulfikê

Li ser kuştina bîhna xwe

Ko jinbav dayik be

Neyar dilber be

Kulfik sêdar be

Ko dem ev dem be

Ziman negere

Serî bê xewn be.

Ez li ser we digiriyam

Digiriyam

Digiriyam.

**G**iriyê heyvê  
Ji bo ronahiya xwe  
Giriyê rojê li ser

vemirandina xwe

Giriyê deryan

Ji xaçkirina pêlan

Ko heyv şikesfî be

Ronî tarî be

Pêl xaçkirî bin

Ko reng ne reng be



Ne sayî ne ewr be  
 Û xame bê tîp be  
 Û ez li ser we digiriyam  
 Digiriyam  
 Digiriyam...

Giriyê revendekî  
 Li ser welatê xwe  
 Giriyê lêvê  
 Li ser girtina ramûsanê  
 Giriyê tembûrê  
 Li ser nemezên xwe  
 Ko welat biyanî be  
 Evîn tawan be  
 Nemez bê deng be  
 Ko diz xweyî be  
 Buhar payîz be  
 Hêvî mirî be  
 Ez li ser we  
 Digiriyam  
 Digiriyam  
 Digiriyam...

**M**in giriyê tevan bi hev vekir  
 We rondikên min nedîtin  
 Ez bi êşên tevan êşiyam  
 Û dîtina êşên min ne kir  
 We dengê axînen min nekir  
 Ji lewre min can û laşê  
 Xwe parçe kir  
 Can dîlek e di girtîxaneyên  
 Çavên we de  
 Laş rêwi ye li ser rîyan  
 Welatan derbider kir  
 Ez mam bi giriyê xwe ve  
 Û we deng n e k i r

5/4/1995



# BAZÊ HÊVIYAN


KEÇA KURD

Li awazên tengezarî  
 Li wê sira ko min xatir ji tarika xwe dixwestin  
 Pelên dara min lerizîn  
 Hemî werek ji laşê min xwe diçinîn  
 Li pêpînk û derîzana kevne mala min diketin  
 Ditevizîm  
 Li neynika rûyê jîna pêşeroja xwe pûnijim  
 Di mêjî de gelek wêne bi hêminî  
 Li ser bejna rojên bûrî  
 Li teşiya henasa xwe min diristin  
 Min fîrêjên bîranînan ji kolan û ji çaseran  
 Bi mijgûlên herdû çavan  
 Bi wan rehên xwîna dilê xwe kom kirin  
 Û bi kêra herî tûj a vê oxirê  
 Destên sipî hevdîtinan  
 Ji gerdena Qamişlokê min dibirî  
 Ji bin tava kela giryê dost û xuhan ez derketim



Li cobarê firmêskên xwe derbas dibûm  
 Ji hêlîna hêminî xwe li ser banê Qidûrbegê  
 Min bazkên xwe diweşandin  
 Û li hewrê rêbwarîyê siwar dibûm  
 Li xewnek ya giranbiha winda dibûm  
 Li gomanên xweş xewna xwe min kelhek bilind  
 Lê kir  
 Li banê wê min dît bazê omîdên min  
 Ji bendera wêjevanî zillik zillik wî hêlîna xwe  
 çêdikir  
 Lê çi bêjim?  
 Ji telişka dilfengiya xwe diçêjim  
 Ji pesarê bilindiya omîdên xwe dişemifim  
 Ji kokela xwîngermîya xwe daketim  
 Li reşîha vê rastiye hildîçenim  
 Ji xewna xwe şiyar dibûm  
 Kelha min a ji bertê bû, dihêrifî.





# HEVALA

## DAWÎ

Nîzar Aqirî


**H**êdî hêdî derbasî  
odeya xwe bû û  
derî li pey xwe girt.  
Bêhna xwe kişand  
û çira pêxist.

Fotoya xwe li ser dîwêr dit.  
Çaxê ko hê xort bû. Li ber  
çavên wî salên jiyana wî  
derbas bûn. Wek birûskê.  
Çend giran e çendîn dirêj e  
ev jiyana. Paltoyê xwe ji xwe kir.  
Derî bi kilitê asê kir. Sola xwe ji  
xwe kir. Çû li ber pencerê li  
derve meyze kir. Şevê herdu  
xistibûn bin tarîtiya xwe.

Ben ji bêrika xwe derxist. Dirêj kir.  
Lingê xwe yê rastê danî ser kursiyê.  
Lingê din danî ser masê. Destê xwe  
direj kir. Ben xist çengela hesinî ya  
li kêleka lempê, aliyê din ê benê  
direj kir. Li dora stûyê xwe pêça.

Baþ girêda. Xwe rast kir. Destên xwe berdan ber xwe û çavên xwe girtin. Xurt  
lingê xwe li masê xist. Hest kir ko dinya hemî wî ber bi erdê ve dikipînîn. Lapê wî  
wek hesin giran bû. Çavên xwe vekirin. Xwest xweziya xwe daqurtîne, lê nikarîbû,  
roniya çirayê li çavê wî dixist. Ronî ewha xurt bû wek ko dinya hemî bûbû þewq.  
Ode piçûk bû. Zimanê wî ji devê wî derket û dengê sar û bê dawî di serê wî da  
belav bû.





# DE BIBEZE

# HEJARO!

HUSEYN MUHEMED

**Ji bo bîranîna babê min**

**H**ejar dibeze. Roja erefeyê ya Cejna Remezanê ye. Hejar dibeze û xwe di ser çeperê ko ji bo kotana mî û bizinan a li dema havînê li hewşa xaniyê axîn hatiye avakirin re, davêje. Beyanî sahi û zelal e. Herçi rojê li rojhilat serê xwe deraniye jî, hinekî sar e.

Hejarê heştalî di nav hevalên xwe de bêguman şampiyonê bezê ye. Di bezê de ji wî re tucaran pêwîstî çênebûye, da bawerîya xwe bi hindê bîne, ko di bîska dawiyê de hemû hêza xwe berhev bike û bi hindê ji hevalên xwe bibe. Di pêşbirkên bezê de biserketin ji wî re gelek asan bûye. Ew herdem beziye.

Dema mirov ji hewşa wan derdikeve, zinarek evrazî dikeve pêşiya mirov û niha jî ji ber berfê tenê bi saya hin şûnpiyanên, ko kûr di erdê de çûne, dikare bizane ka çawa riya xwe bidomîne. Hejar bi zinêr ve ber bi jor diçe. Tiraş carna rê li ber wî wenda dikin, lê ew bi hişyarî hewl dide ko riyê li xwe wenda neke.

Digihîje gupitka Girê Kozê, bê ko westînê di tu derên xwe de hes bike. Ew bi lez dibeze, bi şarezayî pêngavê piştî ya din davêje. Hinekî ber bi jêr de diçe û kadîna mala Simo dibîne. Ji kadînê û wir de riyek zelal tê dîtin, ji ber ko ew der zevî ye.

Hejar, bê ko bîn bi ser bikeve, dibeze. Kuna maran a li aliyê zeviyê di bin berfê de hatiye niximandin. Havînan ew ji wê qulê ditirse, niha na. Niha ew natirse, niha ew bê ko leza xwe kêman zêde bike, di ber kadîn û zeviyê re dibûre.

Riya wî dîsa jî dibe evrazî. Ew pêngavên xwe kurttir dike, lê nahêle ko lez jê kêman bibe. Di piyên wî de hêz heye. Ew rewşa xwe germ dihesîne, germ lê ne tişteki din.

Rê dibe nişivî. Ew ji dûr ve gundê Gerînokê dibîne. Kula-vek hirî li serê Hejar e. Niha ew wî kulavî jî serê xwe dike û di-hêle ko hewayaya hûnik li serê wî bide.

Hejar di tunela çeqên daran, ên ko ji ber giraniya berfê serê wan çemîne û ji herdû aliyên riyê gihîştine hev, dibeze. Ew heta Gola Mamo dibeze û li wir dar kêman dibin. Lê xwe li wir jî nagire.

Hejar dibeze. Tu nişanên daketina sureta beza wî naxwiyan. Ew bi saya şûnpiyên dewarên qaçaxçiyên, ên ji welatê sînorên bakur, ber bi pêş de diçe. Digihîje girê dawîn, ê ko pêwîst e ew pê ve bi hewa bikeve. Ew girê ko jê re Girê Pivokan tê gotin: Evraziyek e ko mirov nikare zehmetiya biserketina wî bi bêjeyan salox bide. Lê kêmbûna lezê li vir jî naxwiye. Pêngavavêtin kurttir



dibin, lê herwiha di heman demê de pêtir pêngav ji tèn avêtin. Dest di tevgerek xurt de ne.

Xaniyê mala metê li serê gir e. Di xaniyê wan ê piçûk, ê ko helbet ew jî ji axê hatiye avakirin du pencereyên piçûk, ên ko bi naylonên qayîm hatine "camkirin" jî hene, lê hatina Hejar ji meta Amînayê û kurmet Segvan û Serhat re ne suprîz e. Hejar dikeve hundir, kulavê xwe ji serê xwe dike û li ser doşeka li erdê rûdine. Metê balguhekî datîne ber pişta wî.

Hejar bêhejmar caran ji malê beziye vir, li ser doşekê rûniştiye, xilmet û karên pê hatî gotine, çay vexwariye û dîsan bi heman leza bezê vegeyriyaye. Carinan, bê ko tu karên wî jî hebin, hatiye vir û vegeyriyaye jî. Carinan wî tenê bi Segvan an Serhat re îskambîl an jî listikek din listiye. Meta Amîna ne tucaran xwe fêrî îskambîlê kiriye û ne jî dixwaze hîn bibe.

Hejar rûniştî ye. Nayê bîra wî ka dayika wî çi jê re gotibû. Ew yek baş nayê bîra wî, lê diviyabû ko ew yek pêşî ji Segvan re bihata gotin. Nedibû ko ew yek zû ji metê re bihata gotin.

Li mala metê tiştine xweş dihatin gotin: "Helbet tu dê bibî xwediyê medalyayên zêrîn ên pêşbirkên bezê." "Tu çayê dixwazî?" "De ka were û firavîne di gel me bixwe."

"Were û bi me re bilize."

Hejar dest bi girînê kir. Ji berî ko ew tê bigihîje ka çi dike, çû aliyê din ê odeyê, hespikê darîn da ber singê xwe û li erdê rûnişt.

Babê Hejar du ji wan hespikan bi destên xwe çêkiribûn, yek ji Serhat û yek jî ji Hejar re. Hejar ê xwe şkandibû, lê yê Serhat hê jî nû bû. Piyên hespikê Serhat hemû pê ve bûn û guhên wî jî, ji ber ko Serhat sê salan ji Hejar mezintir bû û dizanibû matî ji yê xwe bike. Pêşî Hejar rûyê Segvan dît. Hejar li ser doşekê pal dabû û hê jî hespik bi hêz di hembêza xwe de dişidand. Segvan bi dengêk pir rehet peyivî

- Bila ew ji te re be. Tu dikarî li şûna bezîna xwe ya herdem, carinan bi wî bilîzî...
- Babo hatiye kuştin, Hejar got.

KEVOKA SPÎ

Firat Cewerî




SOSRET !!!

Wekî ko hûnê bixwînin, nivîsa li jêr diviyabû di kovara Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, Çirayê de bihata weşandin. Redaksiyona Çirayê ji xwediye nivîsê dixwaze ko nivîs di çirayê de çap bibe. Lê paşê jê re tê gotin: Berî ko nivîs di Çirayê de çap bibe, divê Firat Cewerî wê bixwîne, yan na çap nabe û nivîs di Çirayê de çap nebû.

Ji ber çî be bila bibe, kê çî gotibe bila gotibe, lê ji bo çapa nivîsê, avêtina şertê ko kesê li ser berhemê wî hatiye nivîsandin, berî çapê nexwîne, nabe nivîs çap bibe, yan bi endîşeyên ko ger nivîs çap bibe, dikare filankes ji endametiya komelê derbiçe û bi xwe re hevalên xwe jî bibe, di dîroka çapemeniya kurdî de rûdaneke şermizariyê ye. Bi hêvîya ko bi metod û "sedemên" ji taristanan mayî û yên ko bêhna sansûra serbirên peyva azad jê tèn, rê li ber azadiya derbirinê ya nivîskarên kurd neyên girtin.


Bi çapkirina nivîsa Nerînek li Kevoka Spî, Dugir helwesta çapnekirinê protesto dike.

DUGIR





# NERÎNEK LI KEVOKA SIPÎ



Ehmedê Tewfîq

## Gavek bo pêş, lê ne du gavan ber bi paş?

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, di rojên 13 û 14 ê hezîranê de debatek li ser sê berheman li dar xist.. Berî ko ez derbasî babeta xwe ya bingehîn bibim, dixwazim bi kurta hî li ser ramana vê debatê bipeyivim bê ji kû hat û gelo pêwîstiya nivîskarên me bi debatên weha hene yan na?

Ji demek dirêj ve, min weke xwendevanekî, pêşniyarek pêşkêşî hin nivîskaran kiribû ko di komelê de komîteyek ji bo xwendina berheman bête damezirandin, berî ko bêne çapkirin ew komîte kêmasiyên nivîskar li ber wî raxîne. Bêguman wê nivîskar jî, ji aliyê xwe ve careke din berhema xwe di ber çavan re derbas bike. Ev karê weha gelek havilan bi dest dixîne, yek jê ew e ko xwediyê berhemê li şaşiyên xwe hay dibe û bi rengêkî spehîtir û bi hêztir berhem ronahiyê dibîne, ya herî giring jî xwendevan bêtir bibin, ne wek îro ko xwendevan ji xwendina pirtûkên kurdî dûr bikevin. Lê pir heyf û mexabin ko ev pêşniyar avêtin pişt guhê xwe û ev daxwaz pêk nehat. Weha tê diyarkirin ko "pirtûkên" îro tene çapkirin ne pêwîstî komîten weha ne, ji ber ko bi sewiyeke pir bilind tene nivîsandin. Gihiştîye qonaxekê ko hin kes jî dibêjin: Min dû pirtûk nivîsîne û ez ê yek din jî binivîsînim ji ber ko Komîta Xelata Nobelê ji nivîskaran sê pirtûkan dixwaze. Lê rastiya vê qonaxê ne wilo ye, rastiya wê Epîloga Hesênê Metê ye. (\*)

Piştî ko komelê kongreya xwe li dar xist, diyar bû ko di Komîta Karger de hin guhertin çêbûn. Min careke din ji hin hevalên ko di komîta nû de cîh girtibûn, pêşniyara debata li ser pirtûkên edebî kir, ew pêşniyar bi kêfxweşî hate qebûlkirin û yekser jî şêwazê debatê ji aliyê wan ve û piştîre bi komîta karger re bi rêk û pêk hate danîn û encama wî karî jî li Biskops Arnoyê –li Swêdê-hate diyarkirin.

Berhemên ko ji aliyê sê debatoran ve hatine şirovekirin û rexnekirin: "Hewar û Qêrîn ( Bese şerê birakujiyê) ya Loqman Polat, "Kevoka spî" ya Firat Cewerî û "Hingê" ya Rojen Barnas bûn. Lê yên ko bi nerînên xwe li ser gramer û avakirina çîroka edebî debat dewlemendtir kirin, beşdarên vê civînê bûn. Belê, piştî ko debat qediya, komîtê ji debatoran xwest ko ew tiştên ko hatine rexnekirin bêne nivîsandin û di kovara komelê de bêne weşandin. Ji ber xirecira ko li ser Kevoka Sipî hate holê, weha diyar bû ko komîtê jî nedixwest li ser navê xwe raporteke weha biweşîne, ew pêşniyarek rast bû, ta ko debator bi xwe berpirsiyarê nerînên xwe bin. Lê mexabin ji ber hin nakokiyan ew nivîs jî nehatin weşandin û ez naxwazim li vir sedemên wê nîşan bidim, tenê berî ko ez vê pêşgotina xwe biqedînim, dixwazim bibêjim ko komele bi gaveke pîroz rabû û hêviya me ew e ko ew kar berde-wam be.

## **Ziman kevirê pêşî ye**

Belê, dema ko nivîskarek pirtûkekê ji gelek çîrokan diafirîne û navê çîrokeke ji wan li pirtûkê dike, tê wê wateyê ko ew çîrok a herî serketî ye, ji ber vê yekê dixwazim giraniya şirovekirina xwe li ser çîroka Kevoka Sipî deynim, ya ko di bin baskên xwe de heft çîrokên din jî hilgirtine, weke: Dilê şikestî, Şeva Sersalê, Doktor Sertaç, Heştê Adarê, Stêrkek ji Ezmanê Me Xuricî, Xewna Orhanov, Kêzika Bênav.

Di avakirina berhemeke torevanî de nivîskar bi rola avahîzanekî radibe, alavên avakirinê yên bingeheîn jî, ziman e, tenê dimîne ser hostayekî xwedî gevil ko karibe ji ziman neqş û nîgarên ciwan bi pergaleke lihevhatî di mijarê de bihûne û bigihîje armanca xwe, lê dema ko hevok bi rengekî jihevketî bête ristin û dûbarekirin, wê çaxê mijar û stûna çîrokê hildiweşe. çend nimûne ji kevoka sipî:

"Axx.. Min çî bêriya te kiriye. Axx.. Ez çî dixwazim te hemêz bikim. Ez çî dixwazim birayê xwe tayê bi tenê hemêz bikim. Ez çî dixwazim rohnîka çavên xwe hemêz bikim. Kekê mino , bavê mino, birayê mino.. Lê ez ni-karim..(Kevoka spî. Rûp.9)".

"...Min xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, destên xwe dixistin bin serê xwe û min li stêrkên ezmanê welêt dinihêrî. Wê şevê jî min wilo kir. Bê ko ez kincên xwe jî xwe bikim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û di bin bayê payizê yê sivik û hênik de li stêrkên ezmanê nihêrî..(Stêrkek jî ezmanê me xuricî. Rûp.48)".

"- Keçê bes e! mêrik got.

Ne bes e!

Bes bireye! .

- Ez bes nakim! Divê îro her tişt safî bibe!..(Dilê şikestî. Rûp.22)"

Wek min li jor jî got dubarekirin û jihevketina ziman çîrokê sist dike û wê jî hêz dixê û berdewambûna xwendina wê li ser xwendevan zor dibe, wî bêzar dike.

## **Nivîskar: Barometre**

Belê, ji bo çî xwendevan pirtûkan an jî berheman dixwîne? Bersiv di vê nimûna jêrîn de ye:" Her ko wî lêdixist, jinikê jî dikir qîrîn û digot. Hersê zarokên wan şiyar bûbûn, hatibûn oda wan, ji tirsan xwe li hev pêçabûn û bi îşkînî digiriyan. Ne haya dê, ne jî haya bavê ji zarokan çênebûbû, ew her bi hevdu re mijûl bûn. Nizanim çî li serê jinikê xistibû, serê jinikê şikandibû, ew xwîna ko jî serê wê dihat li ser kincên wê û li hundurê odê belav bûbû.(Dilê şikestî. Rûp.22)"

Baş e jinikê çî digot? û heger nivîskar nizanibe bê çî li serê wê xistibû gelo rola nivîskar di vir de çî ye? Nivîskar barometre ye di navbera bûyerê û xwendevan de, ew tiştê ko xwendevan nizane lê dixwaze bizanibe û ji ber wilo jî dixwîne, lê heger nivîskar bi vî rengi bibêje: ".. Ji aliyê weşanxaneyê naskirî ve hatiye çapkirin.. Ji aliyê hevaleyê wî ve hatibû wergerandin.. Nizanim çî li serê wê xistibû.." Ev gotinên weha tenê di çîrokên bi dev ko di oda de têne gotin, tên bikaranîn, ne di çîroka nivîskî de.

Lê di ya nivîskî de, dema ko nivîskar bixwaze tiştêkî ji xwendevan veşêre lê piştî ew tiştê ha bête holê, ew e ya ko hunermendî û hostayiya nivîskar di avakirina berhemê de diyar dike ko her tiştî di dem û cihê wê de datîne. Ji ber ko gelek caran gotinek bi tenê jî ne di cihê xwe de be, xaçerêka çîrokê tevî diguhêre, ango divê kontrola nivîskar li ser her tiştî hebe ji ber ko ew berpîrsiyarê serketin û neserketina avahiyê ye. Emê li vê nimûneya jêrîn binihêrin: *"Keçikê îdare nekiribû, êrîşî wan kiribû, gava apê wê xwestibû lêxe, destê wî gez kiribû, di wê kêlikê de barîna ko ji apê wê hatibû bêtir barina gayekî anîbû bîra mirov..(Kevoka spî.Rûp.12)".* Gotina "barina gayekî anîbû bîra mirov" rengê çîrokê bi carekê ve guhertiye. Weha tê diyarkirin, wek ko tu du şexsan deynî kêleka hev û yek ji wan behsa bûyerê ji yên din re bike, lê çîrok ne bi wî rengî hatiye avakirin.

## Demançe pêwîst e lê ne neqş û xirxirkên wê

Rast e mafê nivîskar heye ko bi çî rengî bixwaze hevokê di paragrafên xwe de bi kar bîne, lê divê ne tenê ji bo xemilandina çîrokê be, belê ji bo ko ji mijara bingeîn re alîkar be.

Emê li van nimûnên jêrîn binêrin ko herdu jî eynî nîgar in: *"Di sekinandina cara çaran de, lêwik xwe bi awayekî vekiribû, weke guleya devê tivingê xwe di derî re avêtibû, xwe avêtibû dû pîqabek ko nuh ji benzînxanê hereket dikir û çûbû. Her çiqas hin ji van bi dû pîqabê de bazdabûn jî, pere nekiribû; pîqab zû derketibû ser rê û bi sureteke xurt ji wir bi dûr ketibû. Apê keçikê pîlaka pîqabê nivîsandibû û ji mêrikê kal yê li ber benzîmxanê pîrsa wê pîqabê kiribû..(Kevoka spî. Rûp.12)".*

*"..Jê re demançeke çekî ya ko destikê wê ji aliyê zîvkerekî asûrî ve hatibû neqîşandin, peyda kiribûn û xwestibûn ko ew bi destê xwe, wê dêlika xweha xwe bikuje..(Kevoka spî. Rûp.13 )*

Xortê ko keçik revandibû, xwe ji dolmîşê avêtibû dû pîkabekê, lê mebest ji nivîsandina numra pîkabê ne diyar e, xwendevan weha têdigihîje ko di pêş de ev pîlake wê ji bo şopandinê rolekê bilîze, lê ne wilo derdikeve û heta dawîya çîrokê jî tu fonksiyonekê bi cîh nayêne. Bi nivîsandina pîlakê çîrok naxemile û dewlemend nabe, berevajî wê çîrok qels û ziwa dibe. Di hevoka

bikaranîna pênasî demançê (çekî), taybetmendiyên wê (destikê zîv) û hostayê wê (asûrî) tê wê wateyê ko kujdar piştî kuştinê wê nebedî bibe û piştî wê polîs demançê bi dest xe û rapora wê ya balistîk derxe, wê bi zîvker re pêwendiyê deyne û pirsî xwediyê demançê bike û bişopîne. Lê ew jî ne wilo derdikeve.. Li vêderê destikê zîv û hostayê wê ne xwediyê tu fonksiyonê ne. Rola demançê bi kuştina keçikê re temam dibe. Ji bo xwendevan "demançê" pêwîst e, lê ne neqş û xirxirkên li dorê.

Nivîskar bi vî rengî wan dixê bajêr : *" Di ketina bajêr de gava dewriye di rê de li wan rast hatibû û dîtibû ko reîsê belediyê ye, silav lêkiribûn û bêyî ko li dolmîşa wan saxtî bikin ew berdabûn..(Kevoka spî.Rûp12.13)"*. Dema ko dewriye wan disekinîne yekser ew xortê ko xwe ji dolmîşê avêtibû bala xwendevan dikşîne ko wê nuha keçik jî xelas bibe, lê ne wilo derdikeve, tenê silavekê li hev dikin û riya xwe berdewam dikin. Pirs ew e, gelo rola dewriyê di çîrokê de çi ye? Gelo çi pêwîstiya çîrokê bi wê rawestîna heye?

## Kirasê nivîskariyê li her bejnê nayê

Di torevaniyê de çêşandinê taybetiyek xwe heye, ne ko çêşin ji bo çêşnê û tenê ji bo xemilandina hevokê ye. Emê li nimûnên jêrîn binêrin bê çi dibêjin: *"..Ji navê û bi jor ve tazî û bi zikê xwe yê ko weke merşekê pê ve daliqyabû,..(Doktor Sertaç. Rûp.38)*

*Gava diya wê ji xew şiyar bûbû, keçika xwe ya mîna guleke bêstirî di wê rewşê de dîtibû...(Kevoka spî.Rûp.13)*

Zik di civata me de bi meşkê hatiye çêşandin lê ne bi merşê. Bi baweriya min berî ko meriv kirasê nivîskariyê li xwe ke, û wî barê giran bavêje ser milê xwe – ji ber ko nivîskarî berpirsiyarî û peyameke pîroz e - divê hayê meriv ji dîrok, kultur, ziman, jiyana rojane û urf û adetên civatê hebe.

Her weha "gula bêstirî": Stirî sîmbola bela, sûc, nakokî, astengî û şaşitiyê ye. Keçik û xort hevdu direvînin. Revandin ta roja îro jî weke sûcekî tê nîşandan, ango keçikê şaşitiyek di civatê de kiriye û di çîrokê de jî tê kuştin. Di vir de ew sûc "stirî" bixwe ye. Lê heger bi gulek çilmisî bihata pesinandin ( ji ber ko li ser riya mirinê bû) wê xeml û xêza vê hevokê spehîtir bûya.

## Heft gulle li yek cihî ..?!!

Belê piştî girtina keçikê bi vî rengî jî birê keçikê wê dîkuje: " *Gulleya pêşîn ko berdabûyê mêjiyê wê ji hev belav kiribû û ji ber ko berra eynî cihî dabû, lê keçik bi gulleya pêşî re çokên wê fîsiyabûn û hêdî herikîbû erdê, her heft gulle yên ko berdabûnê li eynî cihî ketibûn.. (Kevoka Spî.Rûp.14)"*

Di çîroka Kevoka sipî de, ev paragraf, pirek e di navbera tavloya yekem û duwem de. Tavloya yekem wek me li jor jî gotibû: keçik û xortek hevdu dîrevîn û piştîre keçik tê kuştin. Ya duwem jî ew e ko, birê keçikê piştî kuştina wê dikeve rewşeke psîkolojîk a pir nexweş û di dawiya çîrokê de ew jî xwe dîkuje, ji ber vê yekê jî ez vê paragrafê pir girîng dibînim, ji ber ko bûye sedemê xwekuştina wî.

Diviyabû ko nivîskar di navbera guleya yekem û duyem de bêhnvedanek bida lehengê xwe û hinek hestên wî bida xuyakirin. Wek nimûne destê wî bileriziya, xwêdanek pê biketa, sawek têxista dilê wî an jî rengê wî biguherta da ko erda çîrokê ji xwendevan re hêwî bûba ko lawik wê têkeve rewşeke ne xweş. Lê li vir ez dibînim ko, nivîskar ev bûyer bi rengê sar raxistiye û tu îşaretek ko piştîre karibe bibe alîkarê xwekuştina lawik diyar nekiriye.

## Bêhna Klara Mîlîç a Turgênev

Di çîroka Kevoka Sipî de û bi taybetî di tavloya duyem de ez bêhnê an jî ruhêkî ji berhema Îvan Turgênev, di novela wî ya bi navê Klara Mîlîç (Piştî Mirinê) de dibînim. Berî ko ez paragrafên herdu çîrokan bidime ber hev û ji bo ko nîgar ji xwendevan re zelaltir bibe, dixwazim bi kurta hî xêzên binge hîn yên herdu çîrokan bi lêv bikim. Klara keçek bû ko li ser sehnê pir ji mûzîk, tiyatro û xwendina helbestan hez dikir. Di wê demê de li ser malbata keçikên weha gotinên ne xweş dihatin kirin. Ji bo ko bavê wê rê nede gotinên xelkê, dixwest qîza xwe bide hevalekî xwe yê bazirgan. Lê Klara vî tiştî qebûl nake û piştî demekê terka malbatê kir û berê xwe dide Moskovayê, ko li dor hezar kîlometre dûrî bajarê wê ye. Li wê derê bi grûpekê re di tiyatro de dilîze û di demeke kurt de dibe lîstîkvaneke tiyatroyê ya herî navdar.

*Kevoka S: Rojekê jî wan pîrek ji gundekî çiyê anîbûn, da ko pîrê hin dermanan jê re çêbike û tişteki li ser bixwîne, lê ew belkî zêdeyî deh deqîqan bi pîrê keniyabû,..( Rûp.8 )".*

*Klara M ...Piştî ko metka wî bi rewşa wî hisiya jê re got: Nexwe te xewnek ne xweş dît, tu dixwazî ez ji te re bixûrê bi şewitînim? Aratov ziq li çavên wê nerî û bi kenekî bilind keniya..*

*Kevoka S: ...Wî dixwest serê xwe deyne ser milê xweha xwe û bi dengêki bilind bigirî. Dixwest uzra xwe jê bixwaze. Dixwest jê re bibêje ko wî çiqasî bêrya wê kiriye. Dixwest poşmaniya xwe bîne ziman.(Rûp. 10)... .*

*Carekê mîna ko winda bû lê dîsan xuya bû. An jî mêrik wilo hîs kir. Vê carê ziq li hêla xweha xwe nihêrî; dît ko erê, rast e, ya ko xwe di quncika xênî de kiriye qomik û stûyê xwe xwar kiriye, xweha wî ye. Xweha ko berî niha bi çend deqîqan bi kirasekî spî û tenik bû û rûyê wê gewr û hinarikên wê sorik bûn, niha li ber çavên mêrik bûbû mîna berî bi panzdeln salan; porê wê ji hevdeketî, kirasê wê qetiyayî, zeyif û bêhêz.(Rûp. 15).....*

*"Vê carê ji nişkê ve ji hundirê odê dengê hatibû. Mêrik veciniqîbû, li paş zîvirîbû, dîtibû ko dîsan xweha wî li quncika odê stûyê xwe xwar kiriye û dixwaze ji birayê xwe re tiştinan bibêje. Birayê wê jî hebekî berepaş çûbû, li quncika din ya odê li ser kursiyekê rûniştibû û wî jî bi stûxwarî li xweha xwe nihêrîbû. Carekê, mîna ko niqutîbe dilê wî ko ew ne xweha wî ye, tenê li ber çavên wî wilo dibe, lê weke xweha wî dizanîbû ew çî fikiriye, loma zûka ji wî re gotibû: Ez xweha te me.....Mêrik dîsan jî baş lê nihêrîbû, ew xweha xwe ya berî bi panzdeh sal û çar-pênc mehan anîbû bîra xwe, dîtibû ko tu guhertin di xweha wî de çênebûne, ew spehîbûna xwe ya berî bi panzdeh sal û çend mehan hîna jî parastiye.(Rûp.16).....*

*"Loma mêrik ji nişka ve kire qîrîn û bi qîrînê re jî çend caran li ser hev got:"na, na!" Bi dengê qêrîna wî re dê û bav û xwişkên wî yên biçûk şiyar bûn, lê gava dîtin ko tişteke tuneye dîsan çûne cihên xwe. Lê diya wî pencera oda wî girt, ew li ser mînderê dirêjkirin da, demekê li ber serê wî rûnişt û serê wî yê ko di rengê berfê de bû, mist da. Wî jî eynî weke zarokêki biçûk serê xwe danî ser çonga diya xwe û herdu congên xwe kişandin zikê xwe.(Rûp.15)*

Klara M: ...Klara, heger tu li vir bî û tu min dibînî û guhdariya min dikî, tê xwe pêş min kî. Hîn gotinên xwe yên dawî neqedandibûn ji nişkê ve pê hisiya ko şexsek ji paş nêzikî wî dibe, weke cara pêşîn ko li Bulvarê hevdu dîtibûn, destê xwe danî ser piyên xwe û li xwe zîvirî, kesek nedît, lê hestên wî û qinyata wî zelal bûn ko hin kes li vê odê hene. Lê cara duyem bi renekî zûtir li xwe zîvirî...Ev çi ye!? Li ser kursiyê, pîrekek bi renekî reşpêçayî xwe li hev quncaftiye, serê xwe bi alîkî ve tewandiye û weke ko di fanosa sêkirî de be Klara tê pêş çavên wî. Belê, ew Klara ye! Lê çi rû li ser e; rûyekî westiyayî... Aratov xwe da ser kabokên xwe, belê vê carê biryara wî rast bû, ne bi tirs bû, ne kêfxweş bû û ne jî matmayî bû.... Heta dilê wî jî, ne weke berê xurt lêdixist.....Piştî ko çavên wê li çavên Aratov ketin ji nişkê ve rûyê wê sor bû, bi can bû û çavên wê bi şewq bûn, lêvên wê yên bişirî hejyan.....Aratov kire qêrîn û got: Tu ya ko bi ser ket, ez uzra xwe dixwazim, tê min efû bikî,...an jî min bi xwe re bibî...Ez ji te re me û tu ji min re yî û bi aliyê wê ve çû. Xwest ramûsanekê ji wan lêvên sor bistîne û stend jî. Bi hingivandina lêvan bi germahiyeke pir bilind hisiya, lê ji diranên wê yên sar bi sarbûnekê jî hisiya, ji nişkê ve ew oda tarî bi dengê wî yê xweşewîst hate dagirtin ...Lê dema pîrika wî bi bazdan kete odê, dît ko ew bêhiş ketiye û li ser kabokên xwe rûniştiye; serê xwe li ser kursiyê daniye, destên xwe yên bêcan di ber xwe de ramidandine; rûyê wî westiyayî lê geş e. Pîrika wî li ber serê wî rûnişt û pûke pûk dikir. Xwest ko rahêjê wî û bibe ser nivînên wî lê nikarîbû, bi dengê bang li cêriya xwe kir û herduyan ra-hiştinê û li ser cihê wî danîn.

**Du pirsên ko li bersivên xwe digerin**

Berî ko ez vê nivîsa xwe bi dawî binim, dixwazim hawar û qêrîna xwendevanên kurd di vê qonaxa kembax de bigihînim rewşenbîr û nivîskarên xwedî gevil dako bexçê wêjeya kurdi ji destên “berçemokên şevê” bipolarên, dako careke din perda xemgîniyê xwe li dilê wan yê belengaz û perîşan nepêçe dako “nivîskarên” me bi jehra pênivîsa xwe gula hêvî û daxwaza xwendevanan neçilmisînin û nekujin...

- Ji bo çi hûn bi pênivîsa xwe me birîndar dikin...?!?

- Ji bo çi hûn di naverokên pirtûkên xwe de me dikujin... ji bo ...çi..?!?

\* Çirokek li ser êşeke îro ye ka nivîskarî çawa bûye nexweşiyek û miseletî me bûye.





HESEN

ÇŪ

DIBISTANÊ

## SAMÎ NAMÎ

**P**ek seyda!!...hema bi qesema navê xwedê tu hatibî canê Hesen jî, tê bibî. Dibistana gundê Tilşeîra Aşîta, di payiza sala 1950 de, destpêka sala xwendinê wek her sal hatibû vekirin. Her pênc mamostayên biyanî yên sala par, îsal jî hatibûn.

Di wê demê de mamostên dibistanan ên ji herêma Cizîrê pir kêmtir bûn, û ew çendekê ko hebûn jî li dibistanên bajarên cî girtibûn, ji ber wê yekê Wezaretê Mearifê, mamosta ji bajarên mezîna dişandin Cizîrê. Du salan lê mamostayî dikirin, piştê ew vedigerandin bajarên wan. Mafê wê durbûnê pere bi navê "bedel menatiq naiye" ango "mafê herêmên dûr" distandin.

Ne tenê Namî xwe li gundê Tilşeîrê wekû rewşenbîr dinasî, lê belê gundî û mamostayan jî ew weko berpirsiyarê gund didîtin. Rojên pêşî, yên vebûna dibistanê, Namî serdana bixêrhatinê dida mamostayan.

Namî û her pênc mamosta li hewşa dibistanê rûniştibûn, piştî bixêrhatinê û pirsê halê hev û gundiyan, peyv hate ser dibistanê û şagirtên wê, ka çi kar û bar jê re bêne kirin, nemaze biryara wezaretê: ko tu zarok bê xwendin nemînin, divabû bête cî. Mudîrê dibistanê dipirsî: Gelo kes jî zarokên gund maye ko nehatiye dibistanê?. Di bersiva wî de Namî bê deng dima, lê piştî bîstekê jî nişka ve berê xwe didayê û jê re digot:

Belê ezbenî, hate bîra min, kurê Reşoyê Sofî Ebdoyê tenê bê xwendin maye.

- Wella gerek e çarek jê re bê dîtin, da ew jî îsal bê dibistanê.

Civat qediya. Namî xatir ji wan xwest û vegeriya malê.

Roja din serê sibê piştî taştê Namî ji malê derdikeve, raste rast berê xwe dide mala Reşo. Derbasî hewşê dibe û bi dengê bilind gazi dike: mala Reşo, mala Reşo! Kanî kî ji we li malê ye?.

Mala Reşo di sikakeke teng de bû, hewşeke teng, sê ode tê de bûn, yek bê pencere, ew ya razan û rûniştinê bû. Di nivê odê de erzêleke xerzikan hebû, kufletê malê bi temamî li ser radizan "yanî textê razanê bû", du kuwar bi bilindayiya zilamekî sipartî dîwêr bûn. Herdû dagirtî qûtê malê bûn. Li dîwarê rojhilat nivînên wan li ser kulînê reqîfandî bûn, li teniştê wê sê çar hîzên rûn li ser hev bûn. Herdû odên din, yek ji wan koxa sewêl bû û ya din kadîna kayê bû.

Reşo xwediyê keriyek pez e, maldar e, lê jê re pir zehmet e ko şivanekî ji keriyê pezê xwe re bigre, wê çawa qewlê şivantiya wî bide. Ji ber vê yekê kurê xwe yî bi tenê Hesen kiribû şivanê pêz.


Pîreka Reşo, Fatma, bi lez ji hundir derdiket. Gava çavên wê bi Namî ketin, bi şermekarî got: Xêr e Seyda!!!? Vê sibehê te kerem kiriye û hatiyî mala me. Xwedê xêr bike Seyda!!!?

Namî dev li ken rojbaşî da diya Hesen û got: Xêr e...Xêr e metirse, ka Reşo li kû ye?

Fatma lê veğerand û got: Bi Xwedê derketiye nava gund, lê wextî vegere. Xêr e tu çi jê dixwazî !!!?

Tiştêk nîne, hinek îşê min pê heye.

Hê wilo Reşo da devê hewşê. Gava çavê wî bi Namî ket, matmayî ma û got: Weh...weh...Seyda!!!...Inşaella te xêr be? Ser çavên min û bavê min tu hatî.



Seydayê Mele Ehmedê Namî

Seyda rojbaşî da Reşo û pê re got:

Wella ez bi karekî hatime mala te, hêviya min ji te heye ko tu min vala vene-gerînî û daxwaza min pêk bînî. Di cî de Reşo lê vegerand û got: Pek Seyda hema bi qesema navê Xwedê tu hatibî canê Hesen ji tê bibî.

Namî dev li ken lê vegerand û got: Bere canê Hesen sax be, Xwedê wî ji te re bihêle. Lê wella ez hatime Hesen.....

Hesen?!.....

Belê Hesen. Ez hatime ko tu kurê xwe Hesen bişînî dibistanê.

Hesen...Hesen?!...!

Reşo şipiya bû, lê dema ev yek bihîst, xwe berda erdê û li qeleviska rûnişt, û serê xwe sparte herdû destên xwe, û di ber xwe de bi dengê melûl got: Heh..Heh. Agir kete mala min!!!

- Seyda, ez di bextê te de, tu vê yekê bi min nekî.

Çima...Çima Reşo?..Ez dixwazim Hesen here dibistanê da ko kewden nemîne, û wek zarokên gundiyan hînî xwendin û nivîsandinê bibe, da zana û xwendevanekî zîrek jê derkeve. Reşo... Ma qey tu nabinî ko ji bilî kurê te Hesen pê ve zarokek nemaye ko neçûye dibistanê, ma qey ne guneh e?

Reşo lê vegerand û got: Seyda...Çû...!!!!

Fatma diya Hesen, dibakir: Reşo Kuro Reşo, Seyda mexeyidîne, tiştê ko pê hatiye bere weke wî be.

Reşo digot: Pitê çû!!!. Hesêba berxek bû ji Seyda re hate gurandin, ew kur bû, ew ji ne lazim.

Namî got: Kuro, kur mir çima?. Ezê wî bibim dibistanê, wê ji nû ve dergehê jiyaneke xweş û ronak li ber vebe.

Seydayê Namî ji nû ve berê xwe da diya Hesen û got: Fatma... Divabû tu kar û barê Hesen bikî, da sibehî neçe ber pêz, ezê bêm wî bi xwe re bibim dibistanê. Te his kir?. Fatma lê vedigerand: Bere Seyda ser çavên min û bavê min.

Seyda xatir ji wan xwest û vegeriya malê....û Reşo di halekî pir dijwar de hişt.

Fatma bi şadî û dilxweşî di ber xwe de digot: De bere lo, heme e'ji weke diyê xwendevanan ezê bibêjim: Va ye diçim mël, da fravîna Hesenê xwe yî delalî çêbikim, ji ber ko çaxê vegera wî ye ji dibistanê. Ox, Xwedawo, ma çî ji vê xweştir heye.

Roja din berî rojhilat, deriyê hewşa mala Namî bi hêrs û li dû hev hate kutan. Pîreka Namî Letîfa li hewşê dew dikeyand, hema bi lez dev ji karê xwe berda û ber bi derî ve çû. Gava derî vekir, dît ko Fatma jina Reşo li ber derî ye. Fatma bi dengêkî bilind û tîjî tirs gazî kir: Kanî Seyda?

- Te xêr e Fatma !!!? Letîfa digot.

Ma tu nabînî? Wa ye Reşo pez daye pêşiya xwe û daye ser riya Qamişlo!!!

Çima gidî?!..

Dixwaze pez bifroşe, û dibêje: Ma piştî çûna Hesên ezê çi ji vî pezî bikim. Ji bona Xwedê bere Seyda rabe da wî ji vê yekê vegeerîne.

Wela Seyda razayî ye, de ka hema ezê herim.

Letîfa, bi lez û bez, berê xwe da riya Dekşûrîyê ya ko diçe Qamişloyê, da bighe Reşo. Û bi dengêkî bilind gazî Reşo kir:

Wa Reşo.... Wa Reşo... Ma tu dîn nabî?, hêdî raweste, da çend gotinan ji te re bibêjim. Reşo rawestiya û lê vegeerand: Ma tê çi bibêjî jinseyda!? Hema bi herfa sewaqê ev pez li ber deriyê Reşo êdî nema dimîne.

Kuro malxirabo, ji dêla ko tu bi xwendina kurê xwe şad bibî, tu hatiye vî karê ne di rê de dikî, ma qey ne şerm e ko ji bilî kurê te kes bê xwendin nemaye? De vî pezî vegeerîne, bê ez çi ji te re dibêjim, qey tu dixwazî bibî pêkenîkê gundiyan da bibêjin: Reşo dîn bûye!... tu li vê digerî?

Di vê dan û standinê de, Fatma ji gihîştibû wan. Herdû pîrekan pez ji ber Reşo girtin û ber bi malê ve vegeerandin.

Reşo hêdîka û di ber xwe de digot: Qey Xwedê eva han aniye serê min! De ez ê vê ji biqurtînim.

Hesên ji her û her kovanê xwendinê û çûna dibistanê bû. Gava zarokên hevalên xwe didîtin, ko tûrikê pirtûkên wan bi milê wan ve daleqandî bûn û bi kêfxweşî ber bi dibistanê ve diçûn, keserên kûr dihatinê, û di ber xwe de digot: Gelo heye carekê bibim şagirt û herim dibistanê, û ji şivantiyê xilas bim? Lê ma ka ew kêlî ko Xwedê miradê min bi vê bike.

Pez vegeerîya malê, lê Reşo berê xwe da mala pismamê xwe Hacı Yaqûb (zana û maldarekî gund bû), da ko pezê wî têxe nav pezê xwe.

Seydayê Namî bi çembilê Hesên digre û ber bi dibistanê ve diçin.

Ji wê rojê ve Hesên bû şagirtêkî jêhatî, û Reşo her xwe şermezar li ber Seydayê Namî didit û digot: Çi korayî bi herdu çavên min de hatibû. ☞

KÎ

BERPIRSIYAR

E?\*



REZOYÊ OSÊ

**Y**ek ji astengên nirxandina berhemên kurdî (beşê latîni) neyîna tradîsyonên weşanî û çapemenî ye, ko dibe sedemên sergêjî û xwewindakirina hêzên aktîv di warê çareserkirina nizimbûna banê têgihîştinên rewşenbîrî de, yên ko bi rengê bêserûberîyeke giştî rû didin. Ev nizmî bi gelek faktorên ve tê girêdan, lê berpirsiyarê direkt, di vê prosesê de, her dimîne nivîser û rexnegir. Loma gotebêjên wêjeyî, di warê avakirin û pêşvebirina kultûreke kurdî ya demane de, bêber dimînin û di xîzeke (çixz) girtî de pîkolê dikin. Ev bêberî û pîkolkirin ne tenha gunehê nivîser û rexnegir e, lê barê hin hêzên din e jî, ko bi bêguhdanî hevpariyê di berdewamiya vê rewşê de, weko faktorên alîkar, dikin û bi rola rûdangêrên weşaneke bêkêr radibin. Loma jî di danûstandin û axaftinên rojane de, carcaran jî li ser rûpelên kovar û rojnaman tê gotin ko îro roj nivîserên gêl û kewden di meydana çapemeniyê de pir in, û bi gelek awayan rû didin:

- Mirovê Kurd nexwende ye, lê nivîser e! Nivîserê kurd jî piş bi xwendinê nake, lê nivîser e!
- Nivîserê kurd rêz û pergälên avakirinên wêjeyî nizane, lê nivîser e!.

- Nivîserê kurd pergalên rêzimên û rastnivîsê nizane, lê nivîser e!.
- Nivîserê kurd taybetiyên avakirina hevoka kurdî nizane, lê nivîser e!.
- ...û, bi vî rengî, gelek "lê" yên din!!.

Gelo, çi ji rastiyê di nivîsandin û bilêvkirina van "lê" yan de heye?. Gelo, çapemeniya kurdî di realiteke wisan re derbas dibe, yan na?. Û bingehên vê rewşê li ser çi zemînê hatine danîn?.

Di vî warî de pirseke bi seyr xwe dide pêş. Ew jî ev e, gelo nivîserê bi van pesn û nîşanên jimartî be, çawa rê ji bo weşandina berhemên xwe dibîne?!. Û weşana ko xwe bispêre van xameyên gend û qels, wê çawa cihê xwe di prosesa çapemeniyê de bigire û xwe payedar bibîne?!

Bêgoman, li gorî raxistina van pirsan, çend hêzên aktîv rola bingihîn, di warê çareserkirin û rêvebirina çapemeniya kurdî de, dileyizin. Têkiliyên van hêzan bi hev re pileya birgeşî, têgihîştin û rolnaskirina rewşenbîrî dormador dikin û pêpelûka nizmî û bilindiya banê rewşenbîriya kurdî, li gorî asoyên xwe, bi çarçev dikin, û her weha berçav dikin. Ev hêz jî li sê celebên sereke par dibin:

## 1- NIVÎSER:

**N**ivîserên kurd yên ko bi dûrbîna rewşenbîrî li pîrsgirêkên paşerojê dinerin, erkên xwe bi dilsozî dinasin û bi berpîrsiyarî, bi dilêşî û cegerdarî hewildan û bizavên xwe dikin, da pişkdarên sazkerin û pêşvebirina çapemeniyeke kurdî ya serwext û resen bin. Lê mixabin, ko beşekî gewre ji xameyên sextebaz helperînên xwe, di bin siha navê

nivîser de, dikin û bi rola zîyanokeran radibin. Bi ser wilo de jî bê kontrol rê ji destirêjiyên xwe re di çapemeniya Kurdî de dibînin!. Ne tenha wilo, lê beşdariya vî celebî di bin sîwana hewadarî de tê parastin û propoganda jê re tê kirin. Belê, rengê vê hewadarî çî be jî, eger ne ji giranbuhabûna berhem derkeve, zîyanê dighîne prosesa rewşenbîriyê.

## 2- KOVAR Û ROJNAME:

**K**ovar, rojname û beşên din yên çapemeniyê cihê peyda-kirina gêra çalakîyên rewşenbîrî ne. Bi hebûna wan û di riya nivîser re siqa dibe, praktîka xwendin û nivîsinê bi dest dixê û naçar dibe ko bi hemî cûreyên lîteratûrî ve bê girêdan û berdewamiya xwendin û lixwepirsînê bike, da mercên rewşenbîriyê bi dest xîne û bi rola xwe weko rewşenbîr, rabe û erkên xwe pêk bîne. Lê mixabin ko di gelek waran de ev kovar û rojname rola xwe bi sextebazî pêk tinin û bi naveroka xwe kevalekî pûç û vala dimînin. Ji vê yekê der tê, ko serkar û rêvebirên wan ji piş û ditinên rewşenbîrî şuştî ne, wilo jî di warê zîmanzanîne de qels û kêmin, lê dilên berjewendiyên taybet û kesane ne. Loma, li pey nav û nîşanên zir û xapandî digerin, yan jî (eger gotin giran be jî) wilo ji wan tê xwestin.

Lê hin dostan ez neçar kirim, ko şûna nivîsinê gerek e sipî bimîne.

Ez ne ji behweriyên xwe direvim, lê diyar e dem wilo dixwaze!

Ji vê yekê jî mirov dipelîne, ko çapemeniyeke bêkêr û neşûngirtî, di gelek movikên xwe de, tê belavkirin, nîşana wê dibe bêguhdanî û bi durveyeke bêberpirsiyane tê pêçan.

3.Organên siyasî..

Dezgeh û binetarên kultûrî, yên kurdî, ko bi rola piştgîrî, navdarî û reklamê, di berçavkirina weşanê de dileyizin û li gorî têgihîştinên xwe yên taybetî ji pirsra kurdî re, di hemî wer-selên kurdewariyê de, bi rola xwe radibin û piştgîriyeke aborî û moralî di warê çap û weşanê de dikin. Wilo jî danasîna xwedixamên jîr û zîrek, xwedan hiş û mêjiyên ron, zelal û dûrbîn erkên xwe dibînin, da realîteke rewşenbîrî himbêz bikin û peydabûneke payebilind bi dest xînin, da xwedî desthilat bin, ko pirsgirêkên kurdewariyê di hemî waran de çareser bikin. Lê dîse mixabin ko hin ji van organ, dezgeh û binetaran dikevin bin bandora hin elementên sextebaz û nêzbîn de, yên ko di psîkolojiya xwe de nesax û nesaxlem in, loma jî erkên xwe pêk naînin û rola xwe nas nakin, wilo jî pêwîstiyên demê ji hev naderxin. Êdî dibin gerînokên genîgolan û her kesê qels û bêhêz diqurpînin, dibin bablîsokên kilaxkorî û her kesê sivik û bêrewa, weko kelemperê, li ber bayê xwe çavmiç difirînin. Wilo, ne yê binavbûyî, ne jî yê berbêketî desthilatên danê ne, loma çapemeniya kurdî, di gelek waran de, sergêj û çavmiçan şerên kayîni û bi rengê mozayîkeke leylanî, ko reng û qilafet tê de ji realizma xwe derdikevin, rû dide.

**P**êvî van hersê hêzên sereke, ango hêzên zîlangêr di tevgera çapemenî de hêzeke din bi navê xwêner bi roleke alîkar, di teysadin û serpişkiya nivîsê û nivîser de, dibe mifta kontrolkirina çapemeniyê û pîvanên bikêrî û bêkêriya heyber bi xwe digire. Lê mixabin ko xwênerê kurd di kûraniya nava xwe de, xwe xav û xil dibîne, qels û kêr dinase û nedesthilatiya xwe hemberî nivîsê û nivîser dipelîne. Bi ser vê yekê de jî li ser textê xwexapandinê rûdine, bi mildanî û şêranî li çapemeniya xwe napirse, wê naxwîne û xwe tê re nabîne. Wilo, ji zîlana rewşenbîriyê dûr diçe û bi rola xwênerê hêzdar, tamnas ranabe, êdî hişê wî xilmaş dibe û dikeve bin bandora hoşeyên xwe û ber bi tûmanbîniyê de tê kişandin,



loma ji çerxa xwe derdikeve û bi asanî dikeve gêra mêldariyeke bêbingeh, ko şerê beranî pê xweş dike. Hinga amade ye, ko di vî şerî de koran bi kil û neynik bike, keçelan bi kum û kolos bike, seqet û bawiyar ji bi dar û kopal bike.

Dêmek li gorî raxistina vê panoramayê, çapemeniya kurdî di rewşeke bêserûber re, dûrî guhdan û lêpîrsînê, derbas dibe, lê konê mij û moranê xwe berdide ser têkiliyên hêzên zilangêr û mirov, di vê navberê de tar û mar dibe.

**E**ger em karibin van têkiliyan bi rewani ji hev vewejêrin û erkên her hêzekê nas bikin, hinga em dikarin, ne tenha bersivan bi zelalî diyar bikin û dergehê axaftineke giring û pêwîst di vî warî de, di navbera van hêzan de vekin. Ev danûstandin li gor behweriyên me dê bibe gav avêtineke giranbuha ber bi çareserkirina piraniya astengên demane de, yên ko xwe li dora çapemeniya kurdî radipêçin. Lewra em xwe bivênevê dibînin, ko bandora van hêzan li ser nizimbûna pêpelûk û banê çapemenî û rewşenbîriya kurdî binasin, da çaredîtina sedemên banenizmî û şûndemayinê ne zor û giran bin, da astengên birêvebirina çapemeniyê çareser bibin û problemên dihevalandina ne durist di têkiliyên van hêzan de bêne hilanîn. Da wilo jî ev rewşa gêreberdanî, di çapemeniya kurdî de bê rakirin û pergala jê re bêne danîn.

Belê, beşekî mezin ji nivîseran bi bêkêrî xwe dikşîne gêra çapemeniyê, bê ko sinorên rewşenbîrî û kewdeniyê bizane û wan ji hev derxe.

**L**ê, ko ev beş fêrî alfabêta kurdî dibe, xwe mafdar dibîne ko di dergehekî fereh ve derbasî meydana çapemeniyê bibe, da cihê xwe bi dergevanî li ber embara pend û şîretan bigre û wan, li gorî şelekoriya hiş û dîtina xwe, rêz bike û biweşîne. Bi ser wilo de jî, xwe di bin sîwana hewadarî û mêldariyê de diparêze. Êdî bi xurtî tê himbêzkerin û propoganda

ji navê wî re, ne ji berhem û bîr û behweriyên wî re tê kirin. Lewra gelek navên bêdan weko çiya berz dibin, bi ser ko di rastiya çapemeniya kurdî de çiyayên leylandî dimînin. Lê tiştê herî balkêş di çapemeniya kurdî de, şîyan û hêzdariya rêxistinî ye, ko bi desthilatî per û basikên xwe diavêje ser û xwe raspêr li ser dibîne. Ne tenha wilo, dikare kovikên parmodî yên ko her tiştî û her kesî bêhêz û bêhewes dihêlin û wan bi asanî diqurpînin, biafirîne. Wilo her tişt bi hingavtina van rêxistinan dize, tê hingavtin, yan jî dimire.

Belê, rêxistin tim hewl didin, ko piraniya şax û beşên çapemeniyê bi xwe ve girêdin (wilo jî dezgeh û binetarê kultûrî bisipêrin xwe), da kontrola xwe deynin ser hemî movikên jîyanê û civakê (berferman), li gorî dîtin û berjewendiyên xwe, perwerde bikin, da reşma wê di destên xwe de bihêlin.

**S** edema vê kontrolkirinê jî ew e, ko siyasetmedariya kurdî çapemeniyê serkehniya propogandayê ji xwe re dibîne û wê wek alav bi berjewendiyên xwe ve, ne yên millet ve, bi hiştengî girê dide. Loma, dûrî çapemeniyeke resen, hêzdar û hişmend diçe û wê weko alav bo şerê hebûna xwe bi kar tîne.

Têkiliyên navbera hêzên zîlangêr, di rewşeke wilo de, forma bazirganiyeke prîmîtîv distînin û bazarên ser bi ser têne kirin. Ango, nivîser kirtûpirtên bêkêr dadixe serfûradanê û semyandar buhakî arzan pê dide. Lê ji bêçareyî bazirganiya xwe dimeşînin. Terazûya wê jî bide çapemenî, lewra ziyan digihe form, şêwe û naveroka çapemeniyê bi xwe.

De ka bêjin, kî di vê prosesê de berpirsiyar e?!!. Berê hatiye gotin: "Arzan kirî, heban dirî!!".

\* Naveroka vê gotarê bi taybetî dihingive nivîser, rexnegir û birêvebirên çapemeniya kurdî li Sûriyê. Wilo jî bi gelemperî, dihingive hêzên din, yên ko beşdariyê çî moralî be, çî jî eborî be di weşana kurdî de dikin.

# ŞEVA B ÊDENG

FERHADÊ ICMO

Ş eva bê deng bixemilîn  
 Ey sîtêra li esmana  
 3 Kulîlka dil te av daye  
 Bi sond û soz û peymanê  
 Sînga esman min ramûsana  
 Bi qêrîna êş û jana  
 Rûniştî me li hêvya te  
 Li ser rêka bêrîvana  
 Min ji fîrsa evîna te  
 Dil pêçaye bi birîna  
 Da ji kesî re venekim  
 Paytexta hêsiyê narîna  
 Çav girî ne ji hêsiyê  
 Nabinim xemla nesrîna  
 Weke Eyûb rûniştî me  
 Di nava êş û qêrîna  
 Meh û sala ez dijmêrim  
 Bûm girîyek jibîrkîrî  
 Zivîstana berî û hêsa  
 Bûm şikeftêk wêran kirî  
 Tey dil ketin kenê lêva  
 Ez dil ketim kaniya girî  
 Gulên dêma xweş nîşan in  
 Li min dîsa va zivîrî  
 Dilê xemgîn li hêvya te

Li min dîsa va zivîrî  
 Dilê xemgîn li hêvya te  
 Li ser sînga evîndara  
 Du çavên te bi stêra  
 Têne şûştin her êvara  
 Dûrî sînga gulavkirî  
 Ezê çibikim ji Buhara  
 Buhar sar e tar û mar e  
 Pîştî çavê dost û yara  
 Şeva bêdeng bû hêlîna  
 Kul û êş û derd û jana  
 Dilê xemgîn ji birîna  
 Bûye bûka gulîstana  
 Tu bûyî xewnek girêdayî  
 Di nav ewrê zivîstana  
 Li hêvya te, ez diiketim  
 Reş tarîka wa zindana  
 30, 01, 1996



# QEREÇÎ

OSMAN MEHMED

Bo Beharê

I  
Qereçî wê di pişt beyaniyan re dîq bike...  
ku Qereçiyê dîq kir û keniya  
tu ê nû bi hetava hezkirinê bihesî  
û dilê xwe derxî devê derî  
ewê keziya xwe berde ser dîlokê  
û bireqise li dor rû û êgir gelo qereçî ye!?  
piyên min hingî gêj bûne  
ji wê bêxewiya te ya mîna beyarekê  
mîna dareke berî  
di kokela bêdeng ya evînê de  
-ji xuşexuşa pelan, ji kizina madzer  
weşiyaye evîn.-  
gêj bûne lingên min  
û dewşên wan li hemû ewrên sore  
belav dibin  
lê Qereçiyê  
min soringek jî daniya ser lêvên te  
da hema vê carê wernebûyana  
ji deviyên maçên vê qas cihanê.

22.11.1998

II  
Sê gul hene  
tu ê bêjî sê darikên kuftikê î Prevert  
lê, sê gul  
ne cilik û qepal.  
ser bextê me her duyan  
her sê jî terikîn  
û kêliyeke din weke dîwarekî qelişîn  
wê bi ser me de biherifin, û evîn  
belkî ji nû ve xwe ji toza gulê dawêşîne û were derî dil  
Sê gul hene, Qereçî  
raserî evînê yek vênakeve  
jixwe ya ku te bi terqandina tilikên destên xwe  
ew ji listikê derxistiye  
ewê ne av û ne jî agir lê here.

23.11.1998



Dergehên xewna we vekirî diman..

Asîfankên nalinên we û pencereyên xwelîrengî yên tawanbariya nexşe û sînorên we bi derengmayîna stêrkan re har dibûn. Şeva we, kêlên xwe, goristana bêdengî û hemî rengên keservedana xwe, li ber çavên we wek dilsojiya hedanê radixistin..

Dastana dengê we li ber serê hetavê dimir.

Gullistana rengê we di tem û ewran de, di nimêjên bayê kur de diçelmisî.

Hûn şîniyan dibêjin.

Hûn şahiyên dikujin.

Hûn li ser lêvên ji kevir yên banga xwe gulgenimên bendemanê dîvejînin.

Hûn ji velerzîna asoyên nehwiîrîne û ji semageriya di dogehê de derdikevin.

Dema ku laşê we bi bagera pesindanê dilerizîn û porên we wek çemekî ber bi himbêza axê ve diherikîn û lêvên we wek barana destê sibehê şeva peyvên serdemê ji xewê hişyar dikir, zemîne dest bi govendê dikir, stêrkan dest bi lîlandinê dikirin, esmanî dest bi helbestan dikir, heyva çardeşevî jî dest bi lixwemikurhatinê dikir. Lê tu

ey gulwaza ko ji efsaneyên mirinê hatiye ristin, ne ber bi bahoza me ve têyî û ne jî ferhenga xwe dispêrî mûmên xewrevînê. Me xwe ji boyî cenga laşên we amade dikir, kolanên we winda dibûn, bazbendên we bêbend li ser zendên qedere diherifin û dilê we bi helkehelka me nedişewifî, berbanga maça we nêzî dilbijandina me nedibû, memikên we bi razên çiyar dinixumîn û em li ber barana we ji desthilarîn diketin.

Me navên we bi karwanan re ber bi xweliya sirûdê ve dihinartin û me darên peyvê bi çavkirêmanê av didan.

Bişirîna we û gulhinarên temenê me, guncîna giyanan li dar dixistin. Navên we û hişê me, dîroka xwe bi agirê hevdiran pêdixistin.

Lê me ji tu kesî bawer nedikir ji bilî laşên we yên ji xencera berbangê. Me ji tu pirtûkan bawer nedikir ji bilî bîranînên we yên ji zemawendên gihasevk û beybûnan.

Me ji tu wêneyan bawer nedikir ji bilî lehiya ji nişkê ve ya rengê xwesipartina we.

Û me ji we jî bawer nedikir ji bilî guliyên êgir ên ko xwe li newqa xewna we pêçane!



Ehmed Huseynî

ÇIROK  
ÇIROK  
ÇIROK  
ÇIROK  
ÇIROK  
ÇIROK

# qurban

q u r b a n

**Ç**i cara heye ko Helîmo ji bajêr bihata gund -ciyê serê xwe-berî ko biçûya mala bavê xwe, riya xwe bi goristanê dixist. Goristan jî, li gel ko çend tîrb lê zêde bûbûn, her ew goristana berê bû. Darên kevnare ew dar bûn û tu dibêjî ko qjîakên nav goristanê jî yên berê bûn. Hemû bi yek tonê û bi yek dengî diqîjîyan. Û her tim, gava sira bayê bakur radibû, serma, saw û tîrs bi xwe re dixistin d lanê.

Vê carê jî Helîmo li ber tîrbek biçûk ko bi erdê ve rast bûbû rawestîya. Bîstikekê ew kete mitalan û bi ramanên xwe ve vegeyriya zaroktî û jiyana malbata xwe. Zarokatiya wî weke zarokatiya hemû biçûkên gund bû û malbata wî jî weke hemû malbatên ko di dinyayê de, tenê xwe û Xwedê nas dikirin, bû. Ew jî weke hemû gundiyan, bi sincek tîrsê hatibû rapêçan... Li vê deverê, tîrs û bawerî weha tevlihev dibûn heya ko carna ciyên xwe bi hev re diguhertin. Te nedizani hebûna Xwedê ji ber tîrsê ye yan jî ji ber baweriyê ye. Weha jî ji ber tîrsê û baweriyê wan cin bi nav nedikirin. Li vî gundî navê cina "yên ji me çêtir" bû.

Ev rewşa giştî ya vê herêmê ye.

Lê ya taybetî? Van hemûyan bi hev re di mala Heseno de cihên xwe girtibûn...

Mala Heseno! Hesênê bavê Helîmo. Helîmo kurê bi tenê! Dêmek zarokê herî delalî û gelek tiştên din...

Ica, çima kurê bi tenê? Bi xwe, gerek gotin ji vê dest pê biba. Mane nehênî di vir de ye. Ji heft zik zaro jina Heseno, Meryemê tenê kurek anî. Pêncên berî wî keç bûn û zikê li pey wî jî keç bû. Malbatê ev yek dispart "yên ji me çêtir!" Dihate gotin ko wan tovên zilaman ji xwe re birine. Û geh bi dizî gotin çê dibûn: "Hebe nebe hin tiliyên veşartî di vê pirsê de hene." Çi tilî? " Ji tirs, ew bi nav nedibûn. Qey ji ber çavînokan



bû? Xwedê wan kor bike! Qey ji ber nifira ye? Ma ji wan pirtir! Qey ji ber guneha ye? ...Kî pê dizane. Li vir dîsa gelek tişt tevlihev dibin; tirs, nifir, çavînok, guneh û sedemên din.

Ji ber van sedeman hemûyan, mala Heseno bi ayetên Quranê xemilandi bû û kurik jî di nivîşt û berbejnî de mabû.

Lê tevî weha jî di gel ko xwişka wî Emînayê ya di ser serê wî re, zerî zerhimî û bêkêr bû, ji hemû zarokên malê, kurê malê Helîmo nexweş ket! Ne dût e bi çêbûna kurik, malbatê nema guh dan Emînayê, loma jî ew bê hêl û lewaz bû. Ji ber vê rewşa wê her tim Helîmo lê dixist û kîn pê re dîksand. Ma gelo kîjan zarok hez ji bira û xwişkên di ser serê xwe re dike?



Erê, Helîmo bi bapêşa ko li gund digeriya ketibû. Û mala Heseno ji çi ditirsiyan rastî wê hatin. Dê û bavê di destpêkê de di ber xwe de û dûre bi dengê bilind gotin çima ew, lê ne keçik? Xwişkên Helîmo jî bi van gotinan li xwe dinerîn fena ko ew bûne sedema nexweşiya birayê xwe.

Û her ko roj diçûn dengê malbatê bi duan di asîmanan re derdiket, û rojek nediçû ko melê destê xwe di ser serê wî re nedibir û şerbeta xwe nedidayê, lê nexweşiya Helîmo siviktir nedibû.

Êdî nexweş ji roja pêncan derbasî roja şeşan dibû. Li gor baweriya li vî gundî; heger mirovê nexweş êvara roja heftan çavên xwe veneke, bêmehal ew dibe yê mirinê. Wey Xwedêwo! Ma ev dibe? Kurê tenê û mirin! Di vir de dîsa bawerî û tirs tevlihev bûn. Dê, hêla xwe da ser hev û berî esrê hemû li dora Helîmê nexweş civandin. Û bi dengê bi saw ne mîna yê xwe got:

- Hûn halê Helîmê me dibînin. Gerek yek ji me, xwe jê re bike qurban!

Û çav li hev geriyan... Lê vê yekê dirêj nekir. Pêre pêre awir li ser Emînaya zerhimî rawestiyan. Careke din çerxa jiyane li gora hin qanûnên nenivîsî ko diviyabû, ruhberê herî lawaz bibe qurban ji yê bi hêz re, geriya. Emînayê jî fena ko ji derveyî vê xelekê be, mîna her carê bê deng li ber xwe dinerî.

Erê, li hevhatinek bêdengî li mala Heseno çê bû û diviyabû ew biba biryar. Êdî gerek wext nema winda biba. Û ji hemûyan bêtir, dê ev yek fam dikir. Û wê biryar anî ser zimên:

- Keça min Emîna were cem min!

Emînayê hinekî cefilî û bêtêjin ber bi diya xwe ve çû. Dê bi destê wê girt û dûre bi lez destê xwe li ser serê wê gerand. Û bi dengê recreokî ê e ot:

- Keça min, divê tu xwe ji bo birayê xwe bikî qurban.

Emînayê ji gotina diya xwe veciniqî, bi tirs û bi awirên lavlavî li diya xwe nerî. Erê awirên bi tirs û lom. Û xweş di wan de dihate xwendin "Çima ez?"

Lê belê ne dê û weha jî ne xwişk û bav pê ve hatin. Û berî ko bêdengî bigre ser wan dîsa ji hemûyan dê axivî:

- Keça min! Sê caran li dora birayê xwe her û were!

Vê carê Emînayê bi çavên mişt hêsir li diya xwe nerî. Hêsrên keçê, dê cefiland û dilê wê xurçiland. Lê kêlîka wê awirên xwe bire ser Helimê nexweş, yekser dudilî ji nava xwe avêt û bi qêrînî got:

- Keçê! Keça min, li dora birê xwe bigere bibêje; "Xwedêwo! Ez Emîna me, dixwazim tu ruhê min ji birayê min Helîmo re bikî qu - ban!

Emînayê geriya... Û pê re erd jî geriya. Na. Mane li vî gundî erd na - ere, lê roj digere! Erd negeriya, lê bi asîman re bi hev re qêriya "E...z... Emî...na me, - Emînayê bi gava pêşî kelugirî dest bi duaya qurbanê kir- Xwedêwo! Ruhê min bistîne û ji birayê min re bike qurban!" Bi dijarî duaya xwe got û carekê li dora birayê xwe zivîrî.

Dê jî bi awakî hêstîrî Helîmo he - jand û got:

Helimê min! Dengê xwişka te hate te? Çavên xwe veke, ew xwe ji te re dike qu ban!

Helîmo bêdeng ma. Û kesên li dora wî bêdeng li Emînayê nerîn. Û wê jî dîsa bi kelugirî dest bi gotinê kir û li dora birayê xwe geriya. Dê êdî hîn bi hêztir, bi kurê xwe re peyivî:

- Kurê min! Çavên xwe veke! Xwişka te xwe ji te re dike qu ban...



Helîmo hinekî lebitî, lê çavên xwe venekirin.

Dîsa awir li hev ketin. Dîsa tirs û bawerî tevlihev bûn. Lê diviyabû biryar here serî.

Gerek kur rabe û keç bibe qurban. Cara dawî mabû. Wey Xwedêwo? Cara dawî! Emînayê vê carê bi xemsarî dest bi lata xwe kir. Dê jî devê xwe xwe bir ber guhê Helîmo, bi pêxêla wî girt û qêriya:

- Kurê min! Çavên xwe veke! - Dê bi gotina xwe re, -Helîmo bi hêl hejand.

Emînayê lata xwe bire serî. Helîmo jî çavên xwe kutkutandin û hêdî-hêdî bi melûlî vekirin û pê re got:

Av...

Dê bişirî û destên xwe bi jor ve vekirin û got:

Wey Xwedo! Te qurbana me qebûl kir!


Û şahiyê girte ser malê.

... Her ko roj derbas dibûn, Helîmo diqebilî û ber bi rehetiyê ve diçû. Emînayê jî, roj bi roj diçilmisî û zerhimiya wê spîçilokî dibû. Û rojekê pêla ko wê ev axavtinên ko dê ji Helîmo re digot, bihîstin: "Kurê min! Xwişka te Emînayê, xwe ji te re kire qurban, nema wê biêşîne. Ma ne Xwedê duaya wê qebûl kir, ewê nêzîk bimre." Li gel temenê Emînayê yê heşt salî, ji tirsê dilê wê lê xist û wê heya dawî bawer kir ko ewê nêzîk bimre....

**B** i xwe, çi cara ko Helîmo dihate ser tîrba Emînayê, van gotinan li ber guhên wî dikirin zingînî. Û demê Emînayê yê li ber mirinê dihate ber çavan û her weha axavtina dê jî, bi wê re: "Keça min! metirse! Xwezî bi mirina te! Ma ne, li wê dunyayê tu yê bibî teyrikê bihiştê."

"Teyrikê bihistê" Helîmo ev gotin bi dengê bilind got, pê re jî keserek veda û li dora xwe nerî. Wî dît çend qijak ji ser darekê firiyan ser darên din. Sirek ba rabû. Bi sira bê xwişînî bi darên goristanê ket. Helîmo jî fena ko barekî ji ser milê xwe biavêje, bi lez ji nav goristanê derket. Ew bi riya gund ve, riya jê re nas, bêyî ko li paş xwe binere, çû.

# SEBRÎ BOTANÎ



1925-1998

JI DÎMENÊN  
CENGA MEZIN

# 6

**M**elayê Kose çîroka "cîhad û enfal" ê bi "medh û senayan" pesn û sipasan ji Xwedê re bi dawî anî. Di pey wî re Urfayî destê xwe li zabit û neferan hejand, bala wan kişand ser mêhvanî û got:

- Ev mehvanê me mêhvan e, lê ne mêhvan e jî. Çimkî ev welat welatê wî ye û em jî xelkê wî ne...Wek hûn jî dibînin ew bi salên xwe biçûk e, lê pa "esil û esilzade" ye; ji dîndeha malbateke pak e, nevîçirkê" alimê ezîmuşşein" î zanayê himetbilind mela Îdrîsê Bedlîsî ye. Mela Îdrîs di dema xwe de, şîretkarê dewleta Afîosmanî bû. Em bi saya hîmeta wî serbilind in... Va ye îro jî em li ser rîya Îdrîsê xwe dimeşin.

- Êdî Urfayî, mela û zabit, mêhvanê xwe ê biçûk û esilzade bi delalî birin cihê firavînê û li ser doşekeke ermenî rûniştandin... Piştî xwarinê û destûrxwestinê jî bi nazdarî, lê bi awayekî nespehî, li hespê boz siwar kirin. Ê zabit serê hespî girt, Urfayî ji rexekî ve lingê wî xiste zengoyê, Mele jî bezî çû ji rexê dî ve zengo jê re girt, te digot bûk e. Êdî her sê bi lingan ji ordîgehê bi rex ketin, ta gihandin serê milê. Ji dûr ve mîna bûkekê li ser piştê hespê boz xuya bû... Û em jî, her şeş neferên firar çûn li teniştê kevîrekî mezin rûniştin. Hevalê me Hilmî çimkî rebeno ji axaftina me tînedigehişt, bêz û bêzariya wî ji zimanê Kurdî hatibû gihabû serê difna wî... Teyrekî ji jor de xwe berda û hat pêşberî me, li ser dareke nûbişkivî nişt. Hilmî serê xwe çep û rast bir û anî û stîrî; rondikên wî daketin ser hinarkên rûyê wî û ji bil "ya tîr ya tîr" me ji strana wî fêhm nekir. Lê me zanî ew dixwaze teyro pîrs û sîlavên wî bighîne gundî, mal û mirovên wî û bersivêkê jê re bîne... Hilmî distîrî, dilê me jî wek yê xwe bi rewşa xwe dîşewitand, bêî ku em zanibin çi dibêje. Di vê navê re dengekî ji me ve nas got:

Tew tew, tew tew. Çima we tew-tewek nedida stîrana hevalê xwe? Urfayî bû, ew û mela û ê zabit, piştî ko mêvanê xwe ê esilzade û yawirê wî melayê kose, gihandine ser rîya wan, ber bi newala

şerî`etê vegeriyan û rê jî di pişt me re diçe newalê, êdî ne hay û ne silav, li semta serê me sekinîne û li stirana Hilmî guhdarî kirine. Efendî ji bo em bawer bikin, ko wî qencî li me kiriye, got:

- Na xwe rehet nekin, hatina bînbaşî nêzik bûye û ez dê navê revê ji ser we rakim. Lê piştî vê carê êdî firar nekin.

- Reva çi ezbenî, C. Amêdî got: Em ne reviyane û me firar nekiriye. Em şewwinda û rêwinda ji biloka xwe veqetiyane. Em esker in, em reben in. Bila dilê we piçekî bi me bişewite, wijdan tiştêkî qenc e.

- Yanî ez bêwijdan im ha, ên bêwijdan û tirsonek ew in ko ji cihadê direvin û paşê firar dikin.

- Helbet me newêra em ji efendiyê dilkevir re bibêjin: Bi vê qiyasa te, ordiya 3 bi hemî tabor û bilokên xwe ve, û bi Enwer paşayê xwe ve jî her hemî wek me firar in, çimkî piştî şikestinê reviyabûn. Mela û zabit ta nuha bêdeng mabûn, ji nû wan jî her yekî gotinek li gor kêfa efendî got, serê wî pê mezintir kirin û bêtir li me şarihandin.

Ê zabit got:

- Heke we zaniba ew kî ye, we wilo bisteh û bê minet bersiv nedida. Lê ew li we nagre. Melê jî got:

- Hûn nizanin ev Şahîn efendî çend xwe di ber kesên mîna we de diwestfîne. Wî pir kesên sûcdar bi şîretên xwe anîne ser riya rast û wî hinek zigurd jî bi jin û mal kirine. Loma bi baweriya min ew dê ji bo we jî qenc be, jixwe em hemî ji bo dîn û dewleta xwe kêferata vê cihadê dikşînin.

- Ji wan vebin, dîn, cihad û dewlet, ev navên mezin û pîroz bi çi diçin, çi dighînin, li nik kesên ji meydana cihadê direvin, hey Xwedê tu hiştî ! efendî got.

- Na efendî na, gerek e wek neferên roja gonê, em ji bo wan jî rêya "hedayetê" qenciye... Melê got:

Efendî deng nekir û Melê em birin destê wî, goya dilê wî nerm kir!!! Lê di şûna ko efendî dilê me xweş bike, gote me. Seyda ji aliyê me ve destûrdar e!...

Êdî me riya dîwanê kudand û wan jî riya newala şerî`etê.

Piştî şîvê bû, Melê em xwestin mizgeftê, sê kesên di jî li wir bûn. Mela nehatibû, lê çadira wî bi rex mizgeftê ve bû, kuxte kuxta wî xwe li guhê me dida

- Xurşidooo ka tu li kû yî?

Melê got: Here nik qehweçiyê Begî cezwek qehwê çêke û zû bine. Belê seyda, ser çavan! Xurşidoyî got û çû...

Seyda hat û bi kêfeke seyr silav kir û got:

- Wey pa ez bi vê hatina te û her du hevalên te kêfxweş im Osmano. Hûn camêr in. Mela nerûnişt û em jî hemî ser lingan rabûbûn. Ji kêfa hatina Osman û hevalên wî, Melê êdî hay ji xwe, mêhvan û mêhvandariya xwe nemabû, ta Xorşîdo hat û ji nû ve got:

- Rûnin, rûnin ez dizanim hûn pirr westiya ne, lê westiyana ji bo qencyê be, ji bo dîn û diyanetê be, mirov pê kêfxweş dilbe, ber zehmetê xwe nakeve, ta heger ew êşa be jî, ew hest bi west û êşanê nake, lewma we qenc kir ko hûn hatine. We piçek li me û li xwe kire derengî, lê dîsan ne derng e. Jixwe çolnasên dî betira pêr oxira xwe bi xêr kirine, hûn jî îşev xwe rehet bikin, sibehê zû cenabê Urfayî jî dê we bibîne û bêderengî berê we bide oxirê.

Osman: Ma heker cenabê Urfayî me nebîne çi ye? Madam cîgirê begî agahdar e!

Mela: Çawan çi ye? Hey Xwedêhiştî! Çimkî ji bil kerema Xwedê, xelat û alîkariyên dewletê jî hene. Gerek navên we jî mîna ên berî we, di defferê de bêne qeydkirin.

Osman: Gelo ta nuha çend çolnas hatine.

Mela: Ji bil we şeşên dî hatine, lê ew û hûn jî ne bes in, çunkî dever mezin e, gelek cihên asê jî hene û neferên alaya me neçar in xwe birr birr bikin, her birrekî bo rexekî. Çunkî bê rêberiya çıyanasên şareza nizanin û nikarin jî karên xwe bi rindî bikin û wan deran ji lîs, hêlîn, kun û qulêrên kufr û xiyaretê paqij bikin.

Osman: Yanî wehe.

Mela: Em bi xwe vî xelkî nas nakin, me bi alîkariya camêrên ji we ne çêtir, xwe gihande çendekan û bi dengê me ve hatin. Zilamekî ixdêrî jî heye navê wî Sado ye, me ew jî vexwend, lê Xwedêjêstandî nehat. Seydo bi derew ji qasidê me re gotibû:

- Ez ji lingekî xwe nivseqet im û hem bê sermil im jî. Qasidê me gotibûyê heker tu hafî cil û sermil hene û dê te li hêstirekî jî siwar kin.

Lê wî pîsê çepel vê carê gotibû:

- Ez ne kerê vî barî me...Sado kerê barê şeytên e. Wî faqeta nêçîrê heye, lê ji bo dîn û dewletê, bi siwarî jî nikarê. Êdî me hevî heye ko çawan me hûn pesinandin, dê Beg û dewlet jî we bipesinîne.

Melê bi me re dev bi axaftinê kiribû, me û belkî wî jî hez dikir ko zû ji mizgeftê herin. Lê di wê nêvê re sûfiyekî rihdirêj hat, silav kir û xwe çemand, serê xwe bir ber lingê Melê û bi her du destan girt û maçî kir. Melê lingê xwe ji devê sofî vekişand û got:

- " Estexfirullah " sûfî ez jî wek te evdekî Xwedê me, te çi ye ka bibêje? Sûfiyê ko ew jî mîna Melê 55-salî bû, got:

- Ez mirovekî pîr, bêkes û belengaz im, ev serê sê salan e qerwaşa te çû ber rehma Xwedê, ji hingê ve ez bê bindar im û bi tena serê xwe me. Min kurek û keçek hene; kur bi benîzavafî çû malekê û keçik jî şû kir û çû, û herdu jî ji min dûr in. Tikes nîne ji min re nanekî bipêje û tikes jinê jî nade min. Heke bidin jî, mecîdiyek tenê jî Xwedê raser e ez bîr pê nabim. Eve min rewşa xwe ji cenabê te re got û ez hatime da ku tu jinekê ji ên xezayê bidî min.

- Kuro, sûfî ma tu dîn bûyî. Berî her tiştî qelenê jinika xezayê serê mêrê wê an yê bavê wê an jî yê birayê wê ye, û hem jî keç û jinên xezayê bi fermana dewletê berê her kesî ji bo mucahid û xaziyên di şerî de ne, ta ew hebin nadin kesên din, Melê got.

Sûfî dev bi lavan kir:

- Ez koleyê te me seyda, ez pêlava lingê te me seyda, ji bo Xwedê û qencên Xwedê seyda û...

Mela pê de enîrî û got:

- Ev kar ne bi destê min e, ez nikarim alîkariya te bikim, êdî devê xwe bigre û bes lavan bike.

Sûfî gavekê xwe bêdeng kir û paşê kaxezek ji berîka xwe deranî û bi dilê xwe ê sar û şkestî raberî melayê enîrî kir. Vê kaxezê hiş di serê Melê de nehişt:

- Ji bo çi berî nuha, gava ko tu hafî, te neda min? Ji bo çi te vekiriyê û daye xwendin?. Ma qey ne guneh e, nameya Şêxê "Tillo" ko ji min re şandiye, kesek dî dê bibîne?

-Vê êvarê û li vir, min stukura xwe şkand, ew şaşîfî kir, da bizanim ka Şêxî ji min re çi tê de nivîsandiye. Piştî ko min zanî û va ye tu jî dibîni ko ew nivîsa Şêxî tişteki bereketî ji min re tê de nîne...Min ji xwe re got:

- Ez ê xwe hewceyî seydayî bikim û halê xwe jê re beyan kim, berî ko ez kaxeza Şêxî didimê belkî...

Bû niç-niça devê Melê û "ayeta sebron cemîl" xwend û got:

- Hey sûfiyê delal! Te kaxeza Şêxî daye xwendin û tu dizanî ko cenabê wî gotiye ko ev sûfiyê me mirovekî bêçare ye, loma heke pîrejinek di tenga wî de li nik we jê re peyda bibe, xêreke mezin e. Ma ji hew pêve Şêxê ciwanmêr çi dikare bibêje? Û va ye ez bi agahdariya te û van ciwamêran bersiva Şêxî didim û dibêjim, ko pîrejina di tenga te de li nik me çi dike? Lê belê xwe bêhêvî neke, vegere mala xwe û demek dî were em te bibînin, ka Xwedê çi dike?

Sûfî bersiva nameya Şêxê Tilo ji destê melê girt û got:

- Nasekî min li vir heye, ez dê îşev li nik wî bimînim û sibe herim. Lê min nezanî kenge dîsan serekî li we bidim. Bîst rojên din Melê gotê û sûfî çend pêngavan ji mizgeftê dûr neketibû dîsan zivirî û got:



- ji bo Xwedê seyda, ew evda Xwedê ya ko ji bo min be bila ji ên xezayê be, ne ji cihekî dî be, çunkî a ji xezayê be, bê malbav û bê kes e zû-zû nikare bixeyide. Lê heker bixeyide jî, min nahêle û naçe.

- " Eûzu billah... La hewle we la"... Melê xwend û got:

- Ka bîne, ka wê kaxeza min bîne, ji vir biqêşite here, "estexfirullah" ev mala Xwedê ye sûfî, min gunehkar neke.

Êdî sûfî çû û melê got:

- Jinên xezayê li nik me çî dikin. Tenê çendek anîbûn ew jî bi fermana fermandarî çûn ser qismetê xwe. Jixwe jinên pîr me her bi çawan jî nedîtine û nebînane. Vî sûfîkî ev derd bi serê Şêxî jî aniye ta pê daye nivîsandin. We dît çawan ez gêj kirim û serê civatê jî bir? Xwedê mala Şêxî ava bike, ma kesek dî nebû, ew vî sofîkê ehmeq bişîne.

- Seydayê min ! Ew sûfîkê ko cenabê te dibêje ehmeq e. Ew bi texmîn û pîvana Şêxê xwe aqilmend e, jê çêtir û zîrektir nîne. Lewma ji xwe re kiriye posteçî. C. Amedî gote Melê.

Ev gotina C. Amedî li Melê giran hat, awirek tûj veda û got:

- Ez naxwazim vê gotinê di derheqê Şêxê "Tillo" de bibihîsim. Çunkî li gor vê şaşîtiya te, Şêx jî mîna vî sûfîkê xwe... Melê peyva "ehmeq" bi lêv nekir û got:

- De em veşerî ser dabaşa we; me gotibû ko îfadeya we rast derket, biloka we nemaye û ji bo temamkirina tabora we bilokek dî şandine û neferên mîna we firar û nefirar bi giştî, piştî rakirina firariyê ji ser wan dişînin cihê hewceyî bi wan heye...Em dirêj nekin, sibe roja hatina bînbaşî Xelîfî ye. Ev ciwanmêr ji rutbeya xwe bilindtir e û serbixwey e jî, mîna çend kesek dî ko ev demeke cuda-cuda bi karê taqibatê ve mijûl in. Belkî we jî têkil mefrezeyekê bike. Cîhad jî her cîhad e û lê ev ji bo we xweştir û hêsantir e.

"Pir baş e", me got melayê ordîgehê. Lê em dilşikestî ne û me bawerî bi efendiyê Urfayî jî nemaye...

- Na na, min ew jî agehdar kiriye û qîma xwe pê aniye, Melê got.

-Êdî me jî, ne ji dil xwe pê kêfxweş kir û em çûn cihekî ji ên raketina neferan...Axavtina vê şeva wan hatina bînbaşî Xelîfî bû; nizamim ew kurê qehpê li çî digere...Xwedê neke em rûçîkê wî bibînin. Ev serê çend rojan e, cenabê wî her gav hat û nehat, hat û nehat, tifo li vê hat û nehata wî... Lê paşê zû stiranbêjan bi stranên xwe hemî bê deng û mit kirin: Wey herê... kuro malîîîî hey heyyyy...Û paşê jî rabûn govendê:

De wer wer de wer wer

Lê dewer wer kezî zer.

Xulam memkên gurover.

Serî sor in , binî zer...

Kuro Xelo, filankeso sibe şer û kuştin e, werin xwe hilavêjin, xemên xwe birevînin, guh nedin şîretên melayê çarjin, kîrê Xiço li qûna Piço...

zabitê guherîna nobetê hat govenda wan rawestand. Yekî gotê:

- Em gunehên xwe dadiweşînin, ger te dil heye tu jî werê ên xwe biweşîne, an jî me vebe...

Ê zabit, hindî jê hat kulma xwe lê bir paş û veweşandê û ê nefer bi lez rûyê xwe jê veda û ê zabit devdevkî çû erdê, xwînê di dev û difnê re avêt...Êdî govend nema û deng ji ordîgehê nedihat, te got goristan e. Tenê di navekê re dengê nobedarekî hat, ji hevalê xwe re got:

- Ez hêviya xwe ji Xwedê dikim, ko sibe tofanek rabe û vê ordîgeha me bi bînbaşî ve li ber xwe bibe. Ev serê çend rojan e, ko navê wî û hat û nehata wî em gêj kirin.

Bi hilatina rojê re hemû neferên ordîgehê hatibûne cihê kombûnê û ew kiribûne çardeh komên 40 ta 45-neferî. Kêfa hov û ya mirovan jî vê roja nerm û geş re dihat. Gulokên dûkela spî ji cigaran quloz dibûn. Mela û her sê çyanas jî dihatin, Melê silav kir û got:

- Maşaallah ji Xwedê re ev çi rojeke xweş e looo, xuya ye ko lingê bînbaşî ê xêrê ye.

Berî hingê me hijmara wan bi 400- 500 neferan texmîn kiribû, lê va ye em 600- 650 neferan dibînin. Her komekê nîvzabidê xwe li nik rawestiyabû. Ê ew koma ji me ve nêztir navê nîvzabidê wê Misto bû, saluxa hat û nehat cenabê bînbaşî serî li neferên Mistoyî gêj kiribû:

- Li gor telegrafa vê sibehê gelek bû, ko berî saetekê li vir bûya, pa çima negiha?!

- Bêhna xwe fireh bikin, ma çi hewar e, vê gavê na, gaveke dî,

- Tu dê bibînî ko îro jî ew negihe ez dê vî guhê xwe di binî re jêkim.

- He guhê xwe jêke û ne serê xwe gêj ke, ha ha bigehe.

- Ê heker nehat?

- Heker nehat hingê her du guhên xwe jêke û bavêjê ber kûçikan , na bi Xwedê bila heme bêxe di qûna bînbaşî de.

Hemî bi giştî li benda hatina bînbaşî çavqerimî û dilteng bûbûn. Efendiyê Urfeyî, du zabit û melayê ordîgehê, her çar li derveyî komên neferan li ser rîya hatina wî rawestiya bûn, çav û ling li wan qurimî bûn. Ha ha bigehe, ha ha serkarwanê xêr û bêrê di baskê milê re derkeve. Lê hîç xuya nedibû.

Mistoyî xwe kenand û ji hevalên xwe re got:

- Baş e lawno, dîsan baş e. Xwedê li me hatiye rehmê, îro ne berf û baran û ne jî serma heye.

# HIVDEKER

QENEWATÎ GEMO

1

**G**undê Hivdeker ji herçar aliyên xwe ve bi toza fîr, a ko li ber lingên keriyên pêz radibû, hatibû nixumandin. Wisa jî toz demeke dirêj bi bayê giran ve helawistî dima. Tu tiştî bêdengiya roavahiya havînê şêlû nedikir ji bilî reyandina kûçikêkî ji kûçikên gund û zingîna ji dûr ve ya zengilên keriyên pêz.

Hec Ebdela rahişt misînê avê, zendikên xwe pêçan da ko destnimêj bigire, ji dûr ve sîbera tirimbêlekê li ber çavên wî ket, rawestiya da ko silava siwarên tirimbêlê li wan vegefîne. Tirimbêl nêzîk bû, bi bişîrîneke pan ber bi wê ve çû. Têgihîşt ko ya polîsyaneyê ye.

- Ser sera û ser çava.

- Hecî! Ma navê wî gundî çî ye?

- Kurê min... Hivdeker e.

Bi zimanekî şikesî ko niv erebî û niv kurdî bû got. Hec Ebdula digel ko çûye mala Xwedê jî ji bilî fatîhê tu tiştî bi erebî nizane û ne jî ji sînorê gundê xwe derdikeve.

- De ka ji me re bibêje bê navê gund bi erebî çî ye Hecî! Hem bi pêkenîn û hem jî bi fermandarî yê polîs jê re got.

Hec Ebdula ramiya: Ma ez wergerînim erebî, ji xwe re got.

- De Hecî de, de bipeyive, yê polîs piçekî ew sor kir.

- Sebete eşere hîmaren, bi bişîrîneke zelal û dengekî nizim hec Ebdela bi erebî got.

Yê polîs ji tirimbêlê daket, sîleyek li bin guhê Hecî xist û bi fermandarî jî hevalê xwe re got: Bajo...bajo, me ji wî yê xurîfî xelas bike!

Bû kurtepista Hecî, zîvirî, kûçikên ko bi pey tirimbêla polîsan ketibûn, aniha, li dora wî digerin û teriyên xwe li cilên wî dixînin.

Hec Ebdela lingên xwe li pey xwe kişîşandin û ber bi malê ve çû. Pîrejina wî gazî wî kir û got:

- De bilezîne Hecî da nimêja eşayê li te neçe.

Hecî bédeng ma û hîç nepeyivî.

**H**ec Ebdela dikarî ji tu kesî re nebêje, lê danê sibehê ji jina xwe re got û ber bi gundê ko mamoste lê bû ve çû. Hêdî hêdî dimeşiya, destên wî li paş wî bûn û teqteqa tizbiya wî bû; tizbiya ko ji bilî wê û navê wî tu tişt ji ber serdana wî ya mala Xwedê jê re nemabû.

- Rojbaş mamoste.

Di cih de mamoste têgihîşt ko tişteki balkêş heye, lewra ji şagirtên xwe re got:

- Derkevin bînedanê hetanî ko ez gazî we bikim.

Mamoste li hal û demên mêvanê xwe û li xelkên gund pirsî, cigareyek pêşkêşî wî kir, lê mêvanê wî peyva wî birî û her tişt jê re got:

- Ez dixwazim tu ji min re kaxezekê binivîsînî da li cem walî gilî bikim.

Çavên Hecî mişt hêsir bûn û berdewam kir:

- Di temenê lawê min de bû û sîle li min xist.


Mamoste dixwest bîna wî fireh bike lê bi kêr nehat. Êdî kaxezek jê re nivîsand û bi ximavê tiliya şil kir da ko li jêra wê imze bike. Hecî xatir ji mazûbanê xwe xwest.

Piştî sê rojan, şagirtên gundê Hivdeker nehatin dibistanê. Mamoste jî agahdar bû ko Hecî miriye. Berê xwe da gund da ligel gundiyan beşdarî veşartina Hecî bibe.

Pîremêrek nêzî mamoste bû û jê re got:

- Me ev kaxez di bêrika wî de dît.

Mamoste kaxez ji destê pîremêrî girt, kaxez ji hev vekir û mîna ko ne wî nivîsandibe dest bi xwendinê kir.





# MOHIRDARÊ BÊHÛDEYIYÊ

*Dîmenek ji pirtûka Selîm Berekat a bi navê  
Mohirdarê Bêhûdeyîyê  
Ko di nêzik de bi kurmançî der dikeve.*

selîm berekat

MOHIRA YEKÊ

**Q**îreqîr dijwar e, stûnên textînî yên percana mezîn yeko yeko hil-  
dlîweşin û di navbera wan re xelkên tûrebûyî bi dar û kevîran û yê ko  
dar û kevîran peyda nake, qayîşa xwe dikşîne û ber bi kazînoyê ve  
bazdîdin.

Berî vê qîreqîrê bi rojekê, dîrokê pîvana xwe ya taybetî -eynî wek wê  
bapîvanoka li ser banê belediyê- ya bayê ko tenê ji rexekî ve dihat hildigirt,  
Hetanî anuha jî em nizanin çima ew bapîvanok li ser banê wê avahiye  
danîbûn, avahiya ko karmendên wê bi tenê teraziyên şebeş û petêxan û pis-  
kilêt zal dikirin (musadere dikirin).

Berî vê qîreqîrê û xirecîrê bi rojekê, dîrokê pêlava xwe ya taybetî û nîşanên  
xwe yên req ên di çeşnê nîşanên leşkeran de li xwe dikir, kaxezên dîrokê bi  
nivîsandinên fermî yên hişk û bi gelek bilindgoyan dagirtî bûn; bilindgoyên  
ko li ser hişyarî û geşkirina ereban ber bi gupîtka ko jê şemitîne dipeyvîn wek  
ko çawan em li ser heriya kolanan berî ko em derbasî malên xwe bibin; malên  
ko di çeşnê peykerên ji heriyê bo Xwedayekî ji heriyê de bûn, dişemitîn.

Lê di wê rojê de dîrokê xwe rût kir, teraziya xwe wînda kir, mîna xelkên ko  
ber bi kazînoyê ve bazdîdan ew jî rabû ser xwe û baz da, di nav percanê re  
derbas bû û ber bi karkerên misrî ve yên ko dergehê fagona textînî li xwe asê  
kiribûn çû. Bizdayî bûn, bi devoka xwe ya şêrîn diqîriyan û mîna dîlan li ser  
hev kom dibûn.

Çendî me ji wê kazînoyê hez dikir. Çendîn cara me pere didizîn da ko em  
bêtirs derbasî wê bibin an jî me wek koremişkan xwe di navbera percan û  
kortalan re digihand wê, em biçûk û lawaz bûn, wê çaxê em zarokine lawaz  
bûn, lawazine ko dikaribûn di kuna xilqekê re bibuhurin, Matmayîna me di

çeşnê matmayîna serdemekê li hemberî serdema din bû: Qeyik ne dihingivin avê û ne jî dihingivin zemînê, lêbelê li hawirdora bingehêkî bilind digerin, digeriyan û di bilindbûn û daketina xwe de bîn li me diçikandin. Sihirbazine ko bêyî tu mîz bikî dihêlin ko tu di kovikan de mîz bikî û bêyî ko tu hest bikî şepiyan ji guhên te derdixin, pereyan dişewitînin û li te digerin û te dikin diz bêyî ko tu bizanibî çawan û kînga te dizî kiriye. Komîkine ko pêkenînên bi îrotîkê rapêçayî ji devê xwe berdidan û pêlên qîr û fikandinê di guhdaran de divejandin, me bi xwe nedizani ka ji bo çî guhdar dikenin di gel ko piraniya wan bi erebî ténagihêjin, îca çawan ji devoka ko ji wî rexê dinyayê hatiye tê digihêjin; ji rexê dûr ê pirtûkên cografyaya me ya ko li ser dolmendiya zevî û axê, dirêjahiya çemên me, petrol û masiyên deryayên me dipeyivî û ji me re nedigot çima yek ji wan jî ne milkê me ye. ( Me di hişê xwe de derya bi gola Qasimo dipîva, gola ko 500 meter çarçik (m2) bû). Çend cihine girtî jî li wir hebûn lê nedihîştin ko em derbasî wan bibin: “ Hûn biçûk in... Xwe bidin alî zarokino“, lê me bêvilên xwe dixistin nav depreşên textîfî, da ko em di nav dûman û sermestiya rûniştîyên li ser kursiyên nizim ên ji pûş jinan bibînin; jinên ko bi bizavine req xwe li ba dikirin, her dem û demekê kirasên xwe bilind dikirin û bincilên wan ên sor xuyanî dikirin, em diqîriyan: Oy ev çî artist in“, (li cem me peyva artist beramberî peyva qehp e). Di gel vê yekê jî me ji kazînoyê hez kir; kazînoya ko di havînekê ji havînen dawî de hat û xirecir û koça xwe li ser wê zemîna dûr danî, misriyên ko di destpêkê de, çimkî xelkê pereyên zîv bi ser wan de barandin, xwêdana xwe bi destmalên kaxezî paqij dikirin, ew kazîno anî wê deverê, lê piştî; dema ko xelkên tûrebûyî di gel dîroka xwe ya ji nîşan û payebûnê rûtkirî percan şkandin û her tişt herifandin êdî xwêdana xwe bi zendikên xwe baqij dikirin,.

Di wê rojê de Belavoka pêşîn a desthilatê hate xwendin, belavokeke xemilandî û nijinandî bû, li ser çewtiyan û destdirêjahiyên û yekîtiya ji jor ve dipeyivî, li ser gemkirin û istixbaratan û milletê ko bêguneh e dipeyivî, li ser duristkirinên berevajî û serûbinî hev ...û hd dipeyivî. Û piştî çend katjimêran, piştî ko di şûna matmayîna de tiştêkî din li ser rûyan diyar bû, xelkên tûrebûyî ber bi kazînoyê ve baz dan. Keçên ko direqîsîn ji vagonan derxistin û ji paş ve xwe bi wan ve zeliqandin, bi hêrs; hêrseke ko hîç tûrebûn tê de nexuya bû, lê dilbijandin û harbûneke giştî jê difûriya. Lêbelê bextê sihirbazan û komîkan û karkeran kêmtir bû, cilên wan û kumên wan ên kaxezî û pêlav û şepiyên wan ên biçûk û spî û destmal û keroşkên wan ên sihrê û hin ji kevokên wan jî li ser axê belawela bûn. Ev giş berî ko polis bên, qewimîn, lê wexta ko hatin êdî hemî kes di xirecir û bêserûberiyê de li cem wan yek bûn, lêdanek li wî alî û di nava tîqetîqa tozê de lêdanek li wî alî.

Çend rojan piştî wê xirecirê zemînê dest bi berhevkirina dîmenine dîtir kir: Partî bi dar û kêr û xencer û bi zencîrên ko di bin gumlekan de têne veşartin

û bi sloganên xwe jî daketin kolanên. Di wî temenê xwe yê ter de cara pêşîn bû me didît ko hikûmet partiyekê ji ya dîtir û sloganekê ji slogana dîtir çêtir nabîne, cara yekem bû jî ko me wêneyê karikatûr ên endamên desthilatê li ser kovarekê didît, em qîriyan “ Hey hawar! Dê xwedayê kovarê û xwedayê xwedayê wî jî bi dar ve kin” lê tu kesî ziyaneke negihande yê dîtir, ji bilî partiyên ko piştgirên wan gumlekên hevûdû çirandin û motor û serên xelkên ko ketibûn nav lingan şikandin. Di wê kêlîkê de jî polisên me ew ji hev vedikirin û lihevhatin ji wan dixwestin. Di turimbêlên xwe de şervan berhev dikirin û ew dibirin polîsgehê, li wir jî tenê çend rojan ew dihiştin û tev berdidan. “ Hey wax ev çi hikûmet e!” me digot. “ Hey wax ev çi partî ne!” alîgirên partiyên digotin.

Wê çaxê em zarok bûn, mamosteyên me bi kêfa xwe em derdixistin xwepêşandanên neteweyî, yek ji wan nemaye ko me slogana partiya wî bilind nekiriye. Diketin qirika hevûdû, her yekî ji wan komek şagirt dida pey xwe û ber bi kolanê ve diçû, yek li vê kolanê û yek li wê kolanê û yekî din jî li kolanekê dîtir... lê belê em xwe vedidizîn û ji kolanekê ber bi ya dî ve diçîn û li her kolanekê jî em sloganên wan bilind dikin hetanî ko em sloganên hemî partiyên berhev dikin wek ko çawan me polik berhev dikirin. Matmayîna me jî pir dijwar bû, ne mamoste bi darê zorê me bi xwe û sloganên xwe re dibe û ne jî dema ko me li xwepêşandana mamosteyekî dîtir dibîne, bi me dixeyide, dem dema xwepêşandana bû, bahaneya wê ya yekemîn jî ew e ko hemî dikarin demê ber bi zemawendekê taybetî ve bizivîrin. Hemî jî dikarin qîreqîr û xirecirê birêsin, qîreqîr û xirecira ko jinûveristina wê ji bîr kirin. Hemî jî metirsîyeke hevpar a tu kes zora yê dîtir nabe, durist dikin.

Îca ji bo çi di her kêlîkê de dê xirecirê nekin çavkaniya qirikê? Û ji bo çi dê gewriyên xwe imtîhan nekin madam milkên fermî yên desthilatê ne: Desthilat dibêje biqîrîn diqîrîn, bêdeng bibin bêdeng dibin. Dibêje gewriyên we nînin, li ser depreşan bi kadanên kilsê dinivîsin: Bijîn ên ko gewriyên wan tune bin!. Bimire xaweniya(milkîyeta) gewriyan! Bimire takekesên xwedan gewrî, bimire gewrî, qirik, sorsork, zengelork, pişk û dil û fatreşk û cerg û kezeb û mîzdank û gurçik û zam û kîr û herdû gun! Bimire, bimire, bimire! Em jî diqîrîn: Bimire, bimire, bimire. Bimire pirtûka biyolojîyayê ya ko me hîn dike ko gewriya mirov heye!

Piştî wan rojên qîreqîrê, zingîna dengên me hate bîra me, hate bîra me jî ko em jî -wek bûnewerîne ji bûnewerên xweristê- em dikarin bireyin, biqîrîn, bikalin û bikenin. A ji vê balkêştir jî ew e ko hate bîra me ko em dikarin serkêşîya xirecirê bikin; serkêşîyeke bi rêk û pêk û bêyî tevlihevî. Em bi xwe ji şîrî ve qîjîqîjokî ne, em hînî qîjîqîjîa bi ser ker û qantirên ko barên petêxan dibirin çarçîya bajêr, bûne û em hînî qîjîqîjîa bi ser pez û birayên xwe yên biçûk bûne, sedem hebe yan jî nebe. Em dayikên xwe didin ber çêr û sixêfan, em bi

dijwarî dergehane li pey xwe digirin, herwiha bavên me jî yên ko di nîverojên havîna bakur de vedigerin malê wisa dikin; vedigerin û serên wan bi gulwazên nûranî yên ji westana tal û ji xwêdanê hatine xemilandin.

Anuha em xwedayên qîreqîrê ne, eynî wek mamosteyê werzişê yê ko berî peydabûna xirecirê ji partyê bû; mamosteyê ko di nav mamosteyayan de ji pileya dehan dihate hejmartin, lê belê-çimkî ji partyê bû- xwedayê Xwedayan bû. Bi ser birêvebirê dibistanê de diqîriya û pê re dixeyidî, eger pêwîst bûya jî li mamosteyan dixist, hertim xwe bi raporên xwe yên ko li ser xelkê dinivîsandin û ji boyî partya xwe- Partya ko di wê çolistana rût de yekta û bêhempa ye- dihinartin, paye dikir. Dijûn û çêr ji dayik û bav û bapîr û xak û ax û esmanê şagirtan re jî digotin. Li wê dibistana ko hema ji me re digotin "çêr û sixêfan nekin" çî dihat ser zimanê wî digot. Serê sibê dema ko em rêz bi rêz radiwestiyan, çav li xew û por neşehkirî ko şelîqa çavên me, madê hikûmetê û leşkeran û polîsan û karmendên dewletê dixeland, da em sirûdên serbillindî û payeberziya neteweyî bixwînin, çavdêriya me dikir. Serê sibê hindik dimîne ko ji ber van dîmenên me yên tevîhev û bêmirê desthilata xwe rapêçin û berên xwe bidin miletekî dîtir. Berdilkên me yên dibistanê hergav ji rexê milan ve veçirayî bûn, zivistanan bi herî û ximavê qirêjbûyî bûn û havînan jî bi ava gîha û bi axê, neynûkên me jî herdem bi diranan keritandî ne, pêlavên me ji xwe yan mişt av in an jî mişt xwêdan û toz in, ji pêş ve çirayî ne û bê panî ne.

Em bi xwe wisan in ey dewlet! Em bi xwe wisan in ey mamosteyê werzişê yê ji partyê. Lê belê mamoste ev yek ji me re nedihîşt: "Ey kurên qehpan ma heqê pêlavêkê jî bi bavên we re nîne? Ma ta û derzî li ba dayikên we nîne?", di xwepêşandana xwe ya sibehî de di gel birêvebirê dibistanê vê yekê dibêje; birêvebirê ko ji şerma desthilata xwe ya windabûyî di cil û bergên xwe de diqermiçî, birêvebir dihilîya, me nema ew didît, lê me cil û bergine ko bi çenqekekî çemyayî ve helawistî ne ko bi tenha xwe ba dikişîne û bi hêza bayekî nediyar dilive, didîtin.

Mamosteyê ji partyê ji nişkê ve diqîre: "Xwe li ser zikên xwe dirêj bikin!" em xwe li ser zikên xwe dirêj dikin. Dibêje: "De hetanî nêrdewanên ko ber bi odayên dersê ve diçin xwe li ser zikên xwe bixijikînin!", hetanî nêrdewanan em xwe dixijikînin û bi xijikandin jî em bi nêrdewanan ve hildikişin û em berên xwe didin odayên xwe, li wir jî em derbasî depreşa dirêj a li ser dîwêr dibin. Em li ser zikên xwe ji serê zemînê hetanî dawîya wê derbasî reşahiye dibin. (Ev zemîna serrastkirî ya ko biçûktirîn çavdêrê hikûmetê dikare ji bakurê wê mirîşkekê li başûrê wê bibîne), piştî mîna barkêşên êş bi toza kaçanê nixumandî em diçin û bi destine li ser sîngan xaçkirî li ser rûniştekan rûdin. Wexta ko mamosteyê dera pêşîn derbasî hundir dibe em radibin ser



piyan û diqîrin: “Beyanî baş mamoste“, bi bîntengî li me temaşê dike û bi destê xwe fermana rûniştinê digihîne me, piştî vê êdî pêkenîn dest pê dike.

Ev bûyerên jorîn berî wê xirecirê bûn; xirecira ko meydana kazînoyê bi delingên veçirayî yên jinên semager dagirtibû, berî ko kazîno bibe memikek û birçî wê bikeritînin. Lê anuha mamosteyê ji partiyê qet nema dikare vegere dibistanê, jinên gundî mala wî dorpeçkirin û ew bi cilên xewê ji hundir derxistin, (diyar bû ko hê xew nekiribû), kurê dêlikan, dilerizî, jin diqîriyan: “De bêj bêj, careke dîtir bibêj... Em qehp in ha? Zarokên me kurên qehpan in ha? De bêj de careke dîtir bibêj. Ka diya te ey qehpo? Em dê rehnên diya te ji boyî zilamên xwe bilind bikin hetanî ko bibe heban. Ma diya te fireh e qehpo? Em dê pêlavên xwe têxinê, em dê stûnên dibistanê têxinê“, û bi pêlav û çabqabkên xwe bi bin guhê wî dikevin, mamoste jî hetanî kurahiya diya xwe dilêze. Lê belê ji nişkê ve raperî, raperîneke ko em matmayî kirin. Qîriya û bi ser hev de hişk bû. Dengê wî winda bû û reyandineke sivik kete şûnê. Çavên wî ziq man û rengê wî şîn bû. Yekê ji wan jinan bi gunên wî girtibûn, diguvaştin û bernedidan hetanî ko kefeke spî ji devê wî derket û mîna tayekî şematokî bi ser sînga wî de herikî. Kurê diya xwe ji ser hişê xwe çû, jiserhişçûyîneke goştîni ko tucarî nema şiyar bû. Mamosteyê delalî wek ko çawan hikûmet û qehpikên kazînoyê çûn ew jî çû; qehpikên ko bi navê hunerê hetanî diwazdehê şevê direqisîn û piştî wê jî bi navê kêfxweşiya neteweyî karine dîtir dikirin, çend zilamên ko demançeyên wan di bin gumlekan de xuyanî dikirin, dihatin û ew bi tirimbêlên xwe dibirin.


Anuha bijî xirecir, bijî Xwedayê xirecirê, bijî bext û zarokên xirecirê. Bijî mamosteyên ko êdî-piştî rojên xirecirê- bi kêfxweşî derbasî wanexaneyan dibin û henekan bi şagirtan re dikin û nema li kesî dixînin. De bila xirecir eger mîna vê xirecirê narîn be hemî cîhanê binixumîne. De bila herroj bê û mamosteyekî bêcir an jî sîxurekî bi xwe re bibe. De bila herroj bê da ko li dibistanê desthilata kurên ko bavên wan ji partiyê ne kê m biben. De bila xirecira rehdaçikyayî yekîtiya me ava bike.

Eger ev xirecir nehata dê Mîro bihata, wisa ji me re gotin.

Lewra me spasiyên xwe-em ên zarok- pêşkêşî dilovaniya wê qedere dikirin; dilovaniya ko hikûmetek ya ditir wêran bike da ko Mîro neyê, çimkî eger hat dê du kevîran li ser hev nehêle, dê hişê xelkê ji serê wan bibe. Dê zemîne vegeerîne tenhatî û hovîtî û hişkiya wê ya seretayî, dê zemîne vegeerîne wexta ko mirovan mirov digurandin, da ko çermên wan li xwe bikin.

# KEW

# NAME



## EHMED HUSEYNÎ

Silav Kewo!

Erênaya ko di hişê sibeha te de dimiçiqe, aloziya ximavê ya ko di şûşeya sînga te de veşartî dima û hemî dergevanên xulxulî yên kenê te yî ji kevir, li dengpêketin û fîrahiya êşa te digeriyan. Di girevên birçîbûna çavên te de, nîrên bêhûdeyiyê ber bi talana peyvê ve radikişînin û dilê te hê jî Birca Belek e, rojiyên te ferhengên firtoneyan didizin û dizên..

Di xiyakirina xewna te de çêja nêçîrvanan ji dest xwe diçe.. Cinawir û şevpestên ronahiyê, hêminiya kula te û rewisandina êvarên biryarwergirtin û şirovekirina mebest û xal û têbîniyên sorgula te, aniha, wek fêlbaziya salên bi lez û kutkutandina çavên mehan, zersosina te talan dikin, gerzela banga te ya nişmî bi lojîka bîntengiya dîroka xwe diherifînin û bendên me, yên ji maka gunehkariya deştên nêçîrê, di xirecira nediyar de li xwe mikur tên.

Sûlav bi sûlav em dihingivin xuşîna sirûda te kewo!

Hevok bi hevok em hildiperikin weşîna belgeyên gazinên te kewo!

Bêje bi bêje pirtûka te dihênije

Bextiyariya vikîvala, lêewlebûna qebqebê, ji rehên me dimije Quretiya ji dûmana jîrên mirî, ji bagera bê ba mayî ya şarezayan

---

Xemlûxêza gazindokên van mijarên di mijê de,  
Erê kewo!

Şahiyên ko me ji te re amade dikirin agir bi canê me xistin.  
Bîranînên te neditebifîn. Tu bûnewerekî mêşinî û bi nan û xwê  
bûyî lê demsalên helkehekê xwe li te digirtin. Paşmêrên te ji  
nijada keservedanê bûn, sergerdaniya te jî ji destê poşmaniyê  
bû.

**Geh**

**Q  
U  
L  
I  
N  
G**

**e,  
rêvingiyê dinivîse  
lê mixabin wek te kewo  
bê perwaz e**

**Lalezaran,  
gulên xewnê reşgirêdan  
Perîrûyan  
bi cobaran  
şevistana peyva dijwar  
bi şûrê berbanga zîvîn hilweşandin  
Zulf û xalan,**

**bisk û dalan**

**yadîgarî bi dildarî**

**li ser termê gulistana dîdariyê reng barandin**

**Belg û rêşî bi hilbûnê,**

**gerdeniya xunavgirtî bi dînbûnê,**

**kil û xêza bayê dilan bi tîbûnê,**

**şûn û şopa evînbazan dimalandin.**

Silav kewo!

De rabe bejna kirîstalî ya welatê xwe  
bi sirûdên şewatê û bi nifirên vê ber-  
beyaniyê bixemilîne û hespên  
Amedê yên ko di çolistana xwîna te  
de hîni bînvedanê bûne ber bi alên  
felatê ve, ber bi Sîpanê Xelatê ve  
sernişîv bike.

Rengên xwe ji ber çavên serdemê  
vedize.

Tevna dengê xwe ji pêjna cegerdar  
a dirokê, ji helkehelka şervanên ko bi  
nexweşiya sînoran ketine, ji rûpelên tozgirî û ji kurtepista sêdar  
û gulebaranan bihûne.

Zaroktiya kenê xwe bi ser neynikên Dicle û Ferat de bibarîn, Zê  
û Xabûrê matmayî biarîn û çeçulên xemgîn ên berû û spînda-  
ran, nalina sermedî ya bişkojên hejîr û bihokan û şîngiriya das-  
tanbêjên şevistanê ji ser milên xwe bavêje.

**NE TU BI MIRINÊ TÊR DIBÎ Û NE JÎ SERBIRÊN QULBEROYA TE JI KUŞTINA TE DIWESTÛN.**

De Kêra zingargirî ya dagîrkeran ji ser stûyê xewna me hilîne û  
vê zemîna lêvterikî bi jena dilê xwe av bide hey kewên ji  
kevirên aramê!!

**Geh**

**B**

**A**

**Ş**

**O**

**k**

**e**

**gumandar e**

De heyva Çarçirayê bi pêlên germ ên evîna xwe binixumîne û gerdena zeviyên Mehabadê bi xatirxwestina Qazî Muhemedê şehîd bineaqîşîne û hêsirên jibîrbûyî yên çîçek û gulhinarên Helebçeya belengaz ragihîne bend û ayetên bendemanê.

De zencîrên bêfîkirina xwe bişikîne û ji aloziya wêneyên xwe rizgar bibe û di navbera xwe û Ameda birîndar de bi ximav û rengên keservedana xwe pira felatê ava bike.

Serdema te serdema serjêkirin û talan û wêran û zuhakerina giyan e kewo!!

Serdema te serdema gerdûneke qirêj û cîhaneke sergêj û desthilateke bê destnimêj e kurdo!!

De ber bi qîr û gaziyên nesrîna xwe ve bibeze...

De ber bi dilovanî û lêewlebûna hêlina xwe ve bifire...

De, dê westana dilê me, reşgirêdana alal û sorgulên me ji boyî birçîbûna Bagokê nan û av bin.

Dê gulistana kul û derdên me, goristana xweşewîst û gundên me ji boyî bisertackirina Agirî esman û tav bin.

Dê şkeftên laşên me ji boyî lîlandinên Botana serhişk bargeh û nav bin.

Dê destên berbanga lal bihingivin xuşexuşa rehên te, dê demsalên lêvên te bişkivîn û lavlav bin.

Dê ferhenga mirinê di himbêza te de li xwe mikur bê ey kewê ko rojçêbûnekê divê!

Silav kewo!

Ne xwînrêjî hînî hedanê dibe û ne ji pêlên axîna te hînî vekêşanê dibin.

Ne em dijîn û ne ji çiyayên te bi mirinê dimirin.

Ne fîrêjên hinarkên Ameda te û ne jî dengbêjên sirûdên ax û axîna te ji desthilanîn dikevin,

Lê dîsa jî tu hişê serdemê radiperînî,

Tu çîroka xwe bi zimanê kulîkan ji boyî berf û bahozan dixwînî,

Tu ey welatê ko evîndaran ji sînga dilberan direvinî

De kewo de!

Ma ne roj bi roj dîroka te di zimanê me de şîntir dibe  
Ma ne çîroka te gav bi gav di bîra me de geştir dibe  
Ma ne nehvirîna te rondik bi rondik di cerg û hinavên me de  
xweştir dibe.

Ma ne stîrana azadiya te peyv bi peyv bi xwîna me serxweştir  
dibe.

Ma ne çiyayên tolgirtina te dastan bi dastan di xewna me de  
dîreqîsin,

û bajarên giyanê te di qebqeba kewan de dîtevîzin

û xefîreyên karwanên te di şevîstana koçber û revendan de  
dilerîzin.

Geh

Q

I

J

A

L

K

e,

bi teşîya vê firînê, tinaziyan li zemînê direşîne.

Lê pencereyên banga te hey kewê ko bîrînên xwe bi agir der-  
man dike, asê ne.

Asoyên awirvedanên te şkestî ne û goristanên te bi kêl û alên  
çavîrêmanê neqîşandî ne.

De rabe!

Dest bavêje xemên xwe, hehecikên sînorên xwe di hêlînên  
hişê xwe de biparêze û xweliya sal û zemanan ji ser pêşeniya  
xwe dawêşîne.

---

Destê xwe bavêje efsaneyê Şêx Seîdê kal û kîna xwe bi  
mîrnişîniyên beybûnan, bi tembînameyên şehîd û xweşmêran  
perwerde bike:

Da em bi ser sira te vebin, kewo!!

Da em bi gir û gera te hebin, kewo!!

Da em ji bejinbilindiya te danekevin, kewo!!

Da em li ber termê roja te ranekevin, kewo!!

De rabe!

Palo serê xwe bi gumeguma peyvan û bi derengmayîna  
nameyên firyadê dişo.

Gêncî û Zîlan di keftelefta keskesorê de qublenameya demê  
dişikînin û baskên êvarê diyarî Sasûna mijgirtî dikin.

Mele Selimê Bedlîsî diqîre û pendên serîhildanan dispêre çav-  
reşîya Seyid Rizayê ji gulgeniman.

Li ser piştî Cûdî govendgerên taristanê hespên xwe amade  
dikin û sirûdên xwe pêşkêşî qonaxên ji mirinê dikin.

Li vî rexî tu ji dayik dibî !!

Li wî rexî tu ji dayik dibî !!

Li vî rexî tu rûpelên xwe bi xwînê dinimînî

Li wî rexî tu nexşeya xwe bi xwînê dikeninî

Li vî rexî tu dibistana ji pêt û rivînê divejinî

Li wî rexî tu gavên xwe yên ji ronahiyê ber bi serbilindiya xwe ve  
dilezmî.

De rabe!

Geh ba û geh ta be.

Ger ne tu bî dê kî xwedanê çiyên be

De rabe, di vê serdema bêbav de gulvedana zeman be.

Tu sor nemaye ji bilî xwîna te, da çira azadiyê pêkeve

Tu mûm nemaye ji bilî hêsira te, da taristan biçurise

Tu ken nemaye ji bilî lêva te, da peravên şîniyê bibişirin

Tu evîn nemaye ji bilî dilê te, da reşgirêdana bajaran bireve

De Xweşmêro dera!

1999. 02. 17

*Ji Apec'ê du kitêbên nû!*



Adres:


SPÅNGAVÄGEN 345, FLYSTA

TEL. 08-761 81 18 • FAX: 08-761 24 90

email: [apec@swipnet.se](mailto:apec@swipnet.se)



*Ji Apec'ê du kitêbên nû!*



Adres:

SPÅNGAVÄGEN 345, FLYSTA

TEL. 08-761 81 18 • FAX: 08-761 24 90

email: [apec@swipnet.se](mailto:apec@swipnet.se)

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

# حجلنامه

# I

فصلية تعنى بشؤون الثقافة الكردية

العدد الأول / صيف 1999 (السوبر)

♦ لكل وجود مأزقه وإشكاله . الوجود الكردي يشكل  
إسحاما مضاعفا  
في هذا الإشكال

سليم بركات

♦ الأكراد  
فائض

التاريخ  
والجغرافيا والسياسة  
صحي حديدي

♦ امة في شقاق  
او أبناء الجن  
وليد هرمز

♦ سمو

ترجمة وإعداد : عوني الداوودي



♦ كراكي سليم بركات  
محمد عفيف الحسيني

## HAJALNAMA

1/1999

لأول مرة في الدول الإسكندنافية